
# ADETÊN KURDÎSTAN



M. MAHMUT BEYAZÎDÎ

DEN HAAG, HOLLAND.

# M E L A   M A H M Û T

# B E Y A Z Î D Î

Ew pirtûg 5 - 7 - 1963 an de ji destê " Yekitiya nîvîskarên tarîxî li rex akademiya zanistî a yeketî Sowyet " de derbaz bû ye. Ewê komelê bo derketina vê pirtûgê destûr dane. Pirtûg çapxana wîjeyî a rojhelat li Moskowa de hatiye çap kirin. Çapa dawî de 1050 ḥeb der ketiye.

Rast kirin û hûrnêrîn a wê a dawî de Mst. Qanadê Kurdo arîkarî kiriye.

„... Û ehlê Eqrad eger xwecih
eger Kurd û eger Rewend,qewî
zêde hakimperest û axaperest
in.Zêde îtaat a hakiman û mîr
û axan dikin. Bilanê hakimêd
wan Fileyek jî bibitin êdî zê-
de îtaat dikin,lakîn ji hem-
cinsêd xwe dexsê dikin. Bi înad
û kîn û qederet in. Eger ji
cinsê wan yekî jê re bibine hâ-
kim û axayêd wan îcarî ewî qe-
bûl nakin û îtaat a wî nakin.
Elbette fesadiyekê peyda dikin...

M.Mahmût Beyazîdî

# P Ê Ş G O T İ N

Di nava koleksiyona A. Caba de kitêbek destnvîsî heye ko navê wê " Adet û rusûmatêna meê Eqradiye " Nvîsarê wê M. M. Beyazîdî ye ko le bajarê Beyazêdê de bi miliyet a Kurd ji sala I797 an de hatiye dinyaê. Beyazîdî di nav muhîtekî zana û gelperest de buye û jiya ye. Gelek baş hînî Erebî û Farisî û Tirkî buye kultur /çande / û edebiyata /wîje / wan baş nas dikir.
Beyazîdî çêtir tefsîr Qur'an û Quran xwande bû.
Ew xortaniya xwe de li medresa Beyazîd de dixwîne, û paşê diçe nîva alîmên derve. Piştî ko tehsîla xwe temam dike dîsa vedigere Beyazîd û li wê derê ders dide. Gelek mowzûanda tişt nvîsandine,qismek li ser Edebî û gramer in.Lê bê guman xebata wî a enteresan li ser folklor û adetên Kurd in. Xebata wî a giringtir li ser gramatîka zmanê Kurdî e. Ko navê wê jî bi nîv Erebî û nîv Kurdî ye. " Rîsale î texfehtû nexlan fî zmanî Kurdan. " Ji wê gramatîkê de ji karêm Elî Teremaxî îstifade dike ko ew jî li ser zarava Hekarî û Rawendiya ye...

Kitêbê de fehm dibe ko Beyazîdî Şerefname jî xwendiye û bi dîtina nvîskar û etnoğrafekî adetên xelkê xwe ,baweriya wanî dînî ,urf û tradîsiya wan ber hev dike û dide berçav.
Konsolosê Rûsan Aleksandir Caba li Erzurumê M.Beyazîdî dîtiye .Lewra ko ser zanistiya Kurdî Beyazîdî gelek alîkarî ji wî re kiriye.Bo ko Caba koleksiyona xwe dewlemend bike.Beyazîdî bi xwe ji kitêbxana xwe gelek kitêb ji boy Caba verîkirine û eserên xwe ê şexsî jî gelek pêş-

kêşî Caba kirine. Eger Caba û Beyazîdî ew xebat nekirîbûna niha ew eser li dinê tune bû û winda bûbû....

Wê eserê de jiyana Kurdên Misilman, cemiyeta wan sîstema aşîrî, esasên hakimiyeta feodalan û ser kultura materiyala Kurdan, malavakirina wan rabûn û rûniştina wan nvîsiye. Weko dinê destxetî û senata wan, zewac û jin anîn, bawerî bi şêx û seyidan, û baweriyên xurafe dane berçav...

Li nîva eşîrên kurdan da gelek buyer henin ko bê sebeb in. Berberî û dijminahî bi yekûdu re pir dikin û hevûdu du dikujin. Lêbelê xelkêre ne wîsane, biyaniyan re zehf serî xwar dikin. Û pasîfin. Tenê eşîrî a wan daîmiye, her eşîr bawer e ko ew bi eşîrên din çêtir in. Xwe herweha bilind dibînin û kêmaniyê qebûl nakin, pirên caran ew jî ko ûşt a şerên wan dibe...

Zana Stîg Wîkander kitêbek nvîsiye ko navê wî " Eîn fest bei den Kurden ûnd îm avesta ko bi zmanê Almani ye. Tiştên ko Beyazîdî nvîsîne û tiştên ko heta niha mayîne û tiştên ko Wîkander gotîne ne zêde ji dûrî hev in. Mesela bila ko wê pirtûgê de behs a cejna " Varişnî Harezana " dike ko Ew cejn meha 9 û IO an de çêdibû. Ew cejn heta niha jî bi awakî din li nav Kurdên Tirkiyê, û Îranê û Yezidiyan ên QafQas de henin...

Li ser Kurdên Îranê binêr A.A.Arekeliyan K.Xaçeturof, O. L. Wîlçewskî, T. F. Arîstof û li ser Kurdên yezîdiyê Qafqas jî xebatê S. A. Egîzerof heyîn...

Beyazîdî bi xwe li ser Kurdên misilman li tirkiyê nvîsiye. Rûdenko dibêje " Ew adetên meha ne tenê bi nav Kurdên Misilman da ne. Lê min bi xwe li nav Kurdên din de û derve jî dîtine...

Ew kitêb du destnvîsèn xwe li kitêbxana Lenîngradê de henin. Yek bi dest hatiye nvîsîn û Hicrî I274 û Miladî I858-59 hatiye nvîsîn bi

herfê Erebiye. Cih cih Caba bi horfên / tîpên / latînî not kirine berê...

Qopiya diduyan I868 an de hatiye nvîsîn. Ew jî ji kitêbxana şêx Nazar ketiye destê Caba. Caba ji wê kitêbê tercumeyî Fransizî kiriye...

Ez pir spas dikim ko ew kesên Kurd ko alîkarî a min kirine ko navê wan Aso ê Cango, Şiko ê Hesen Alî ê Cango, Îsmaîlê Sado ,û Moro ê Mehemedo...

Dîsa spasdarim ko alîm ê mezin Kisliyakof ko nesihat li min kir ko ji bo vê xebatê, wekî din jî min ji Wîlçewskî û Mesçerof jî alîkarî dîtîye...

M. B. RÛDENKO

# P Ê Ş K Ê Ş Î

Min ji mêj ve navê seyda Beyazîdî bihîstî bû. Paşê derket ko ew ne yek in ,lêbelê du heb Beyazîdî ne. Yek MAHMÛT Beyazîdî û yek jî Îsmaîl Beyazîdî. Ewana bra ne an heval in û an gundîne ez hîn jî nizanim.Tiştekî niha zanim ew du lawên Kurd bê misl û bijarte ne. Ewan zûda di dîrokê Kurd de cih girtine lê mixabim ko em ta niha li cihêd wan bê xeber in...

Va pirtûg a Mele Mahmût Beyazîdî,rojekî bi tesadûfî ket destê min. Eger ko min tîpên Erebî nezanî bûma dîsa jî pê agahdar nedibûm. Gava ko min serê vê pirtûgê xwand "Adet û rusûmatina meî Eqradiye " û nvîskar jî M.Beyazîdî,wê gavê çawa ko ez bi dinyayekê dest xînim. Bi lez û bez min ew xwand. Paşê jî da çap kirin...

Kitêb bi du beşan çê buye,Parek bi Kurmancî û tîpên Erebî,par a dinê Rûsî û bi tîpên kirîl /Rûsî / hatiye nvîsîn. Ew qismê bi tîpêd Erebî min vegerand Latînî. Pêşgotina wê jî bi Rûsî bû. Werger a wê ji bo min gelek zehmet çê bû,bila ko kesekî Kurdî û Rûsî zanibin min nedît, ta ko paşê braderekî Kurd li Fransa ko Rûsî zanî bû vegerand Kurdî lê ew jî ne bi temamî ,û her weha bi kurtî nvîsand. Dema ko pêşgotina wê ber çav bû û hate fehm kirin me baştir zanî ko M.Beyazîdî kî ye û ew kitêb bi çi awayî hatiye afirandin..

Ez zehf spasî canik jinê, banû M. B.Rûdenko dikim ko ew pirtûg dîtiye û ji bin teregên / ref / toz girtî de derxistiye û paşê jî bi xebatekî zehmet ew pêkêşî xwandeyên dinye ê kiriye...

Li ser wîje û dîrokêd Kurdî de zehf tişt hatine nvîsin û gotin,lê bi rastî pir kêmasiyekî mezine ko li ser psîkolojî û jiyîn û karektêrêd vî miletî qet ne tişt diyar bûne. Ko em zanin tu materiyalek jî tu nîne.Seyda Beyazîdî bi çi awayî ketiye ser vê rê,zemanê xwe de ew tiştên weha giring û pêşverûhî bi çi cesaretî nvîsiye,û îlham ji ku girtiye nizanim,lêbelê seyda di nav ûlemaên zemanî de şoreşek bi tenê hildaye milê xwe. Û şik û bawerî heye ko seyda ew tiştana li ser şîret û nesîheta A.Caba nvîsiye û dibe ko li ser daxwaza Caba û bo xatirê wî dest pê kiriye...

Dema ko seyda destpêka vê pirtûgê kiriye salên wî gihaştine şêstî,bila ko kal buye. Lewranê sîstema neql dana nvîsa wî de merov tê digêhê ko ew mîna kalekî bi dil û can û weko merovekî çîrokbêj berpêş dike.Hevok û bêjeyan yekbiyek,kin û mufassal,bi cih û şund dide û li ba hev kom dike...

Ew destnvîsa ko 1858-59 anda çê buye,ketiye destê Caba û ko Rûdenko dibêje,Caba bi cih cihan de bi tîpên Latînî not kirine berê. Ewê din jî ji kitêbxana şêx Nazar ketiye destê Caba.Di sala 1868,yanê deh salan dû ya yekan de.Eviya min baş fehm nekir.Ko qopiya diduyan kê nvîsiye û kê daye şêx Nezar û kê dîsa daye Caba û bo çi ? Weko em zanin şêx Nazar ji Kurdekî Îranê,bawerim ji Urmiyê ye. Ew bi kitêbxana xwe meşhûr bû,bi hezaran cild kitêbên / pirtûg / wî hebûn. Serpêhatiyên şêx gelek enteresan jî heyîn. Lêbelê ez baş nizanim ko bi rastî bîyoğrafiya wî çawaye...

Aleksandir Caba ew kitêb bi şexsen tercumeyî Fransizî jî kiriye û him jî ji qopiya diduyan. Yanê ewê ko ji kitêbxana /pirtûggeh/

şêx Nezar derxistiye...

Mele Mahmût Beyazîdî wekî din jî xebata wî henin.Ko pêşgotinê de jî diyar dibe ko eser a wî a giringtir li ser rêzmana /gramatîka/ Kurdî ye. Û rêzmana wî ko navêd xwe nîv Erebî û bi nîv jî Kurdî ye. Min nekarî bi tam tercumeyî Kurdî jî bikim. Bila ko ez zehf lê gerîm ko boy peyda kirina wê pirtûgê,serfiraz nebûm. Weko min peyda kir, ko nesîb be ezê wê jî derxînim.Navê wê jî ew e: "Rîsaleî tuxfetûn nehlan fî zmanî Kurdan " Wergerî : " Mêşhinguvek le ser rîsaleyî /wêşane / zmanê Kurdî de " Û a diduyan jî wîsa tercume dibe : " Nvîsarek li ser dema kevnareyên Kurdan ".

Wekî dinê wexta ko bano Rûdenko dixwaze wê p pirtûgê derxîne,serpêhatiyên wê pirtûgê gelekê zêde dibin. Pêşta hewaleyî Kurdnasekî dike,ew Kanadê Kurdo ye. Kurdo vê kitêbê rasteqînî dike,paşê diçe qomisyonekî de qontrol dibe ko rejîmê Sowyetê de sansor heye û giringe. Ji wê jî diçe çapxana Moskowa de bo zmanên rojhilatî çap dibin,çap dike.Lêbelê ew pirtûg ta niha I20 sal emrê xwe buye.Vê emrê xwe ê dirêj de kitêbê pir cih û dest,adres û şund guhartine. Serpêhatiya wê bê guman ko a yekî merov zêdetir dê heyîn. Beyazîdî Kurd û Kurdnasî min divêt baştir dizanit buya. Guya merov ko pirtûgê dixwîne ecêb dimîne ko boy zanistî a wî. Lêbelê dîsa jî kêmaniya xwe henin û yaxûd kitêbê de tehrifat heye an guhartin e.

Zmanê wî zmanê Hekariyan û Rawendiyan e.Rawendî ew jî ta'îfeyekî Kurd e ko Selahettîn Eyûbî jî ji wê malbatê ye. Ew zarava ê Hekarî û Rawendî merkez / sentral / ê Kurdîstan de têtin axaftin. Heta Bohtî û Silivî û Van û Mûş û Heta Behdinan jî ew zarava ye...

Lêbelê gotina me ne zaravane zmanê kitêbê ye.Bi edebiyatekî qenc,lîsanekî safî û nvîsanekî teknîkî hatiye çêkirin. Her wekî ko zehf bêjeyên biyanî jî tê de heyîn,ên Tirkî û Farisî û Erebî,ger ew ne Kurdî bin jî îro ew kelîmena temamen fehm dibin û tên xebitandin,ên weko : " şayed,eger,yaxûd, ta'îfe, îqtiza,îhtiraz,nezer,ekserî,îlla, taxim,maazallah,sefer,elbette,mimkûn,mikerrem,miyesser,hwd û hwd.... Ecêb ewe ko ji Beyazîdî virda sed û ew çend sal derbaz buyîne zmanê Kurdî de tu pêşveçûnek nebuye,û kesî tiştek nekiriye serê.Ger wan pirs û bêjeyan em ji metînê derînin,cihê wan dê vala bimîne û ên nuh jî tu nînin,û nvîsarî jî wê mimkûn nebite.Dinêhirim ko zmanê Kurdî a wîjeyî a îro jî ji hîmê ko Beyazîdî daniye tê....

Mele Beyazîdî hevokên xwe kurt û kin in.Tê de niqte û bihnok û işaretêd gramatîkî zehf nînin û li her cihekî de tim û tim " Û " xebitandiye. Ji ber ko nvîsana Erebî de jî wîsa dibe. Beyazîdî cihên ko lazim e niqte û bihnok hwd.bên ewî "û " xebitandiya,weko serê paraxrafan ,paş niqteyan,pêş navên mezin û cihên din.Cihê nefes girtinê de " û " têtе xebitandin ko eviya karekteristika zmanê Kurdi ye. Min bi xwe jî dîtiye ji nav gundiyan de ko pir kes gava qise dikin ewê bêjeê " û " zehf dixebitînin û carînan jî pirecar tên,weko : û û û ew kesên ko gotara xwe de i ih ih an jî a aa ah hwd dibêjin...

Gava ko merov vê pirtûgê baş û bi diqqet dixwîne şiyarî tiştekî daxuyanî dibe. Kitêb /pirtûg / destpêkê de bi zmanekî dom dike û ew

zman berewpêde tête guhartin û hêdî hêdî ji hev dûr dikeve û dawî dikeve rengekî din. Mesela weko pirs û bêjeyên " dikin,bibin,bibarin,bikirin,bibezin," îptida ew kelîmena bi wî awayî hatine nvîsin,lê rûpel I3,I4 de pêde hêdî hêdî,ji kêm ber ve zêdetî hatine guhartin. Paşê jî temamî bûne yek. Yanê hemuyan "ti" girtine û buyîne " dikitin,bibitin,bibaritin, bikiritin,bibezitin,hwd. Eviya tiştekî giring e û edebiyatê de / wîjeyî de / ferqekî mezin e. Lewranê ko rengê zarava î hatiye guhartin. Ji ber ko em nizanin ko seyda çi qeder demê de ew pirtûg hazir kiriye. Dibe ko kar a wî a paşin li a pêşin baştir be...

Beyazîdî bi sîstem a xwe Kurd bi çend BEŞ a par ve kirine. / yanê çend gûrûb hesêb kirine/ Kurdên goçeber re gotine"Eqrad " ko ew jî bûne hîmê eser a wî.Bila ko tim û daîm behs a wan kiriye.Goçer û Berîtîyan û warangêr /Ên ko diçin waran / Eqrad /goçer / ne cihên wan heyîn ,zivistanê li germiyan û Havînan jî li çiyan in...

Kurdên ko gundî ne, yanê ên ko xwedî erd û xanî newan re jî gotiye Kurdên " XWECİH "î / yanî cih girtî,temel danî, sabît, / Gora seyda ko behs a wan dike ...

Yek jî behs a Kurdên " maî " / meî,meyî / dike ko bi alî me de baş nehate fehm kirin. Weko me zanî ew jî ên medenî, an burĵûwazî ê zemanî bûne...

Bila ko çi rengî dibin jî bibin Kurd yek jor û yek jêr gişt mîna hev in.Ew tiştên ko seyda behs a wan dike, cih ê ko ez bi xwa jê hatime / Dersim / %90 henin. Tiştên ko Beyazîdî dîtine û bo vê eserê bijartine wîsa bi marîfete ko pir rexne û îxtirazî nehiştiye...

Bila ko cih cih heye,tê de xoşbînî û an safitî heye. Weko rûpel a 34 ande ko behs a kumreşî û bedgumaniyê dike,zêde pêş ve diçe an jî zemanê me îro zêde pêş ve çuye.?

Bi rastî jî kumreşî û bedgumanî Kurdan de kêm heye. Ko zêde hebûna wê wan dost û dijmin zû bi zûyî binasîna. Yek jî kumreşî a vî pirtûgê bikirina. Lewranî tarîxê vê kitêbê de kumreşî û bedgumanî heye. Her weha ko merovekî mina Beyazîdî ,ko Kurd û Kurdîstan bihost bi bihost,ling bi ling zaniye û dîsanê jî xelitekî bênaborînî wê bike. Mimkûn nîne bawerî nabe. Weherweha ko ew kitêb di sala I963 ande der tê ,yanê li nîva hereketa M.M.Barzanî de. Cihderketin a wê jî yeketî Sowyet e û kitêb li dinyaê belav dibe....

Em zehf spasî canik jinê M.B.Rûdenko dikin, lêbelê hêvîdarim k o tehrîfat û têkguhartin tê de tunebe. Xoş weha be jî ne ko demû dewrana îro de ye...

Gava ko M. Beyazîdî rûpel a pêşîn,yanê dest pêkê de dibêje : " Zemanêd mazî de Kurd û Eqrad tune bûne,hemû Ereb bûne (!) Evana ko çûne sînorê Ecem û Îranê ,lîsanê wan hatine guhartin û falan û fîlan....

Lewra min pêşta jî got,gava ko merov bi dîqqet bixwîne zmanê pirtûgê a pêşin û a paşin ne yek in. Ez dibêjimko ,ew deh û diwazdeh rûpelên pêşin ne a Beyazîdî ye. Tehrîfat bûye...

Em nizanin da Beyazîdî anegore wî zemanî ko Erebî mode bû,weha gotiye,zîra kesên ko xwe dikirine Ereb bi rûmet dibûn.Lewra ko li bin tesîrê dîn de bûn. Dibe jî ko seyda xwe bi digel modeî kiriye. An jî li ba şêx Nezar û an jî li ba Caba hatiye guhartin.Lazim e ko

merov wan her du qopiyê destnvîsî bibînî....
Îro hinde xortên Kurd henin ko bi Kurd bûna xwe re serbilind û mexrûr in,zanim ko cih cih ên kitêbê de dilên wan diêşin. Mesela rûpel a 39 an de ko behs a Sultan A.Mecît kiriye û guya edl û asanî,wî û Asakîrî nîzamiye a wî aniye. Û yek jî rûpel a 4I an de ko gotiye Kurd zêde ji tifingê ditirsin. Guya tifing ko li cihekî hebe Kurd naçin. Lê ez dê bi xwe bawer dikim ko ger mitral jî hebe Kurd wê biçin....

Rûpelê 34 ande jî behs a endamên lêzimekî ko li cihekî radizin kiriye. Şayed eger gora wî zemanî wîsa bûyî ye û dîsanê heta îro jî heye. Min bi xwe jî li alî Cizîrê gundekî nêzûkî Ex Sîlopî de wîsanê dît....

Weko merov kitêbê dixwînit tê de gelek xelitên îmlayî û gramatîkî dibîne. Ew jî kêmasîyek e li zmanê Kurdî de û xelkê Kurd de ye.Bila ko hîn zmanê xwe çênekirine. Ger bi zarava û serzman,ger bi aşîr û malbatan ew zman texlit bi texlit têne xwandin û nvîsîn. Kitêbê de jî ew texlît henin. Weko : " Merov,mirov- Sîwar,sûwar,siwar - Wenda,winda - Şewlekî,şolekî - Şom şowm - Hwd û hwd...

Yek jî hinek caran ew tîpên lêker bi hev re û hinek caran jî bi cêh hatine nvîsîn. Mesela Ayib e,ayibe - Xort in, xortin - Li piştê ne, li piştêne - Kêm in, kêmin. Hwd...

Herweha me dîqqetî rêz û rêzikên gramatîkî nekir. Bixwe ji tîpên Erebî ko vedigere tîpên Latînî hinek xelitên zehmetî jî dibin. Çend tîp henin ko rengên hevûdin bi temamî nadin. Weko 'î û ê'bi Erebî de ' y ' tête nvîsandin. Lêbelê va pirtûga jî ne rêzman e û ne jî dawa zmanê Kurdî a modern dike. Adet û rusûmatêna meî

Eqradan pirtûgekî zanistî û zanyarî û materiyalekî tarîxî ye. Navê vê pirtûgê wekî din jî ew e : Kîtab a adet û rusûmatêna me tawaîfêd Eqradî ye û ûsûl nîzamata gel

K U R M A N C İ Y E ...

DX : Ew pirtûg bê wêne bû, wêne ên ser û navîn de çend diyariyek ji welêt me kirine berê...

I6 Adar I979

W e r g e r
Delîlo Îzolî

BİSMİLLAHİRAHMANİRRAHİM Elhemdulillâhî Rebbîlalemîn vesselâtû ala Muhammedin ve alîhî ecma'în...

Ema baed me'alûmî cenabêd talib û naziran bibitin ko ew tewayîfêd Eqradan ji tewayîfêd Erebêd bedewî êd berêne. Ko zemanê maziyê de ji wan tayfêd Ereban miqdarek cuda bûyîne û bi wan kenaran de bi eyal û etfal hatine û hemû qebîleyek bûne. Û berê lîsanê wanî jî bilûmûm zmanê Erebî bûne û yek ta'îfe bûne. Heta wî zemanî lefz Kurdîstan tune bûye. Paşê weko hatine van etrafêd xalî û sînorêd Îran û Xoresanî ew merovêd hatî mesela çend in elbette her yekî navek heye. Heyder,mesela navê yekî bûye. Herçî ji ewladêd wî Heyderî zêde buyîne nîsbet bi bal wî daye Heyderî. Ewana buyîne tayîfeyek û mesela navê yekî Zeylo buye, herçî ewladêd ji wî merovî zêde bûyîne nesebet dayîne bi bal Zeylo,Zeylî Zeylî gotine. Ta'îfêd mayî jî bi vî tarzî ne.Mirad ji ta'îfan eviya her ta'îfeyek kurê bavekî bûne û bi mirûr eyam her yek buyîne ew qeder mal. Îcarî ew ta'î fe jî bi neseb nêzûkî û bra û pismamiya wî zemanî xeyret a yekûdu dikişin û eger dûrin li yek û du nabine xweyî,qebîle û tayfe ewna ko beyan bûn...

Û lefz Kurd û Eqrad eşyê wî girde ye. Yanî ber hev û cem'î kirine. Bo munasebetê ko ew Ereb bûyîne cîranê Îran û Farisî û Xoresanî,êdî ji lîsanêd wan tayfan yekûyekû berhev û cem û exz kirine û hêdî hêdî zmanêd xwe ê qedîm ko Erebî ye terikandine û mirûr zeman û borîna îyamî buyîne hinde eşayîr û qebaîl û ta'îfe...

Ew navê wan ko maye Kurd û Eqrad ew sebebe ko zmanê berhev,yanê mexlûtî ye. Yanê gird kirdî ye. Ji Farisî û Îraniyan. Îcarê ew tayfana ji etrafan bi nav Kurd û Eqrad hatine navdan û buyîne miletekî meallûm...

Ema zmanê wan jî biheseb cih û mekan bazê îxtilaf tê heyîn. Lewranî lîsanê Ereb û Farisî û saîr jî dîsanê cezwî muxayîret heyîn. Mesela lîsanê ehlê Hîcaz û Misrê û Erebêd Bedewî naşibine yekûdu.

Û zmanê Farisiya derî û Pehlewî û Iraq û Azerbeycanê naşibine yekûdu. Lîsanêd Eqradan jî cezwî tefewat heyin...

Eqrad qewî zêde nesl û neseban hesêb dikin û amare û axayêd wan bazen seyyîd û bazen sahebzade heyin Weko Abbasî û Xalidî û Ensî û Merwanî ji vana tê heyin.Wekî dinê ekserêd eqradan heta heft bavan navêd ecdadêd xwe dizanin û xizm û eqrabayetî winda nakin. Mesela xizm û pismamê yekî li şamê û Misrê heye bav ewî xizmî û ewî pismamî ji boy kurê xwe wesayet dike ko li filan welatî û filan gundî ji filan tayîfeyî navî ew e,xizm û pismamekî me heye îqtiza bike ew jî dîsanê ewî wesîyetî ji boy ewladêd di xwe dike...

Û eger şayed Eqradan xwîndarî û yaxûd dawayekî maye di welatekî de digel merovekî hebî, dîsanê weqît û tarîx û bitefsîl ewî dawayî ji boy ewladêd xwe dibêjin,wasiyet dikin.Adetê wan ko eger yek ji wan mesela biçite xerîbetê rastî a esl û neseb a xwe bizûwî ji boy kesekî nabêjin.Lewranê îhtiyat dikin.Ko nebe xwîndarî û ya dawaîdarek kewn ji neseba wan biderkevin.Xulasa dawa di nîva wanda kewn û zayî nabe. heta heft bavan dawa dajon...

Û Eqrad qewî xweyî bext dibin.Eger mirovek qebahatekî mezin bike û biçe xwe bavêje bextê yekî elbette ji qisûra wî diborin û bi bext sondê dixwin û bi cih derewî tiştekî naxine bextêd xwe.Weko yekî gote yekî mesela ew şola weha ne buye weko ewî gote ko di bextê minde be ko wehaye elbette pê bawerî dikin.Yanê bi bext sond xwarin di nîva wande qewî mezin e.Wekî mesela: merovekî dixwazin bikujin,xwe avêtine bextê yekî,elbette bi çi tarzî bibe dê wî mirovî ji kuştinê xilas bikin...

Adetê Eqradan di şerî de weko mirovek ji hespê ket û esîr bû êdî mimkûn nîne ewî nakujin.

Adetên Eqradan ên piçûkan (piçkan ) bêşik kertme dikin,mesela: Weko ji boy mirovekî keçek welidî û ji boy mirovekî jî kurek welidî hema di roja weladitiyê de ewî keçî didine wî kurî. Bêşik kertme di-

bêjin. Heta ko ew kur û keç balix dibin,êdî men û poşmanî nabit.Îcarî dawat a wan herdukan dikin.

Û di nava Eqradan da berdêlî jî dikin.Mesela:yek xweh a xwe dide yekî û xweh a wî jî ji boy xwe distîne,weyaxût keç a xwe dide yekî û keç a wî jî ji boy xwe distîne.Yanê mibadele dikin.Herkesek ji wan mesref a dawata xwe dibîne.

Ekserî Eqrad dawatan di weqtê Biharan dikin.Lewranê Zivistanan cihyekî tenha ji boy bûk û zava ê tunîne.Wekî davatê dikin li goşeyekî konê weyaxût li goşeyekî malê perde girê didin.Ew bûk û zava li pişta perdê gerdek dibin.Wekî dinê adetêd wan ên weko cih tunebin,bav û kur û bra digel jinêd xwe hemû di malekî de radizin û radibin û keç û bûk êd wan jî kesekî narevin.

Biharan wekî bistî Adarê elbet biderdikevin konan. lakîn nêzûkî cih ê qişlaxê ji wî re warê kozê dibêjin.Heta ko pezêd wan zê yî xilas dibin,paşê ji wî warî bar dikin.Warê biharê û payîzan newal û cihêd talde û deşt dibin.Lakîn warê Havînê zozan û çiya dibin.Her deh û bist û sîh û çel malan mexsûs warek heye.Kesek li warê kesî nahêwêre û lê nabe xweyî. Û caran dibe ko li ser wan di nîva wan de nîza peyda dibî û ji boy birekê malan ko digel hevûdu dihêwêrin,ZOME dibêjin.Û axayê wî birr î û rî spî ê wî cimaatî kî ye. Mesela:Elo û Heso ji boy wî Zomeî Zom a Elo û Zom a Heso dibêjin.Birrêd wan jîweko gundan nav heyîn Zome a filan kesî û Zome a filan axayî dibêjin.Mesela: îqtiza bike ko tu zomeyekî pirs bikî ji boy te salix didin,diçî û dibînî.

Şayed weko tirsek hebî îcarî ew êl hemû berhev çiya û deştekî dibin û li ser hevûdu nêzûkî yekûdu konan hêşî li hêşîyê wek ordiyan vedigirin.Ji bo vî berhevî a konan re ABİR dibêjin,filan aşîrî bi Abir danîne dibêjin.Weko şayed tirsa wan ji kenarekî de heye ji çar kenaran riya yek saetî yek çend siwaran qerewal datînin.Û bi xwe jî şev ranazin.Hespêd wan hazir lixab kirî û bi xwe jî çek girêdayî guhdarin.

Heman ji kenarekî deng û pêjnek peyda bûyî hemî sîwar dibin û bi vî kenarîde diçin.Eger yeqîna dijminan kirin,def a wanî hewarê heye,bi şev û bi roj çiwextî dibe ewî def a hewarê li cihekî bilind didîne qutan ko deng bigehê hemû Zomeyan.Weko dengê defê peyda bûyî êdî mimkûn nîne kes bi şuva namîne sîwar û peya bi kenarê defê de tên.Û jinêd wan malan jî her yek konistûnekî digirin destêd xwe û hazir dibin,guhê jinan jî li şerî ye.Dîtin ko şer hate nêzûkî malan ew jin jî bi wan istûnkonan diçine şer û yariya mêran dikin.Dibe jin jî têne birîndar kirin û kuştin.yanê weko şerekî weha li ser malêd Eqradan biqewîmin jin û mêr şerî dikin.Û eger şayed hezar siwarêd dijmin bêne ser çel pênce malêd Eqradan dîsanê qedr nabin ko ewan belav bikin.Lewranî di nîva Eqradan ewê meseleyekî menşûr e.("Şerê kûçikan li ser dêlan in."Eqrad şerêd ser malan bi xeyr ji mirin çare nînin,elbette heta mirin şerî dikin.Û adetekî dinî di şerêd ser malan de heyin,weko Eqrad dibînin ko dijmin zehf û ew bi xwe hindik in, herkes siwar dibin û ji nîva malan biderdikevin û xwe didîne çiya û kerrekî asê.Û malan dispêrine dijminan û bi xwe jî dûr ve difkirin û çek û aletêd xwe î herbê dirist dikin û digel yek û du qewl û qerarê dikin ko nerevin.Yek ji wan dibêje ko eynegozê min Meho maye dest dijminande û yek ji wan dibêje ko " wayê keç a mın Eyşê " maye di dest dijminande, weha xeyretê didine yekodû,îcarî dijmin ji bi talan û mal hilgirtinê mijûl dibin.Bilanê zehf bin jî ew xweyîêd wan malan bi carekî hicûm û êrişê tînine dijminan û jinêd wan jî di nîva malan de bi kiziman arîkarî a wan dikin,elbette dijminan perîşan dikin.

Û taîfeyêd Eqradan weko xwîndarî nebitin qewî mayîlê qetlê ninin.Di şerî de weya rêbirê de mirovan digirin û dişêlînin,berdidin.Lakîn ji boy şola xirab elbette mirovan dikujin.Heta jinêd xwe û keç û da û xweh a xwe jî elbette qetl dikin.Û jin jî ji boy şola xirab mesela: Da,keç a xwe,û xwesî bûk a xweû xweh xweh a xwe bi şev dixeniqînin.Weyaxût jarî

dîdînê û qetl dikin.Ji axa û rîspî êd wan kesek pirsiyarî nakin ko te ji bo çi ewa kuşt...

Weqi'a revîna jinan ji mêran di nîv wande adet nînin.Jin û keç êd wan ji kesî narevin.Weko miletê Efrencî ye.Ew jîserbest in lakîn boy îhtiqadî ko ew xirabiyê nakin.Îllah eger yekî ji wan şola xirab ki rin, çare nînin elbette ewî dikujin.

Jin û keçêd wan qewî şolekar û cesûr û xweyî hiner in.Kulav û berr û xalî û têrran çê dikin û malêd ko xulam tê nînin hesêbekî xulamê malê jin in. Her çî şola malê bibe jin dikin,heta hespêd mêrên xwe jî jin xwedî dikin.Mêr bi xeyrî şerî tev şewlekî (şol) qewî nakin.Bazar û dayîn û standin jî bi jinan dibin û têne meclîs ê û îqtiza bikitin tevî şêwr û îdare û emûrî (derbaz kirin ) dibin û kerem û êqrama mêvanan dikin.

Weqtê Eqrad ji warekî bar dikin diçin warî din malêd xwe bar dikin û çend sîwarêd wî zomeyî heyin hemû rimêd wan li ser milan û dest vedayî li berayîka koçan diçin û jin koçan dajon.Ew pez û deve û g garanêd wan li pê koçan diçin.Li wan sîwaran re pêşkoçî dibêjin.Şayed weko dijmin ji pêş ve peyda bibî ew şerî li berayîka dikin weko bûye şerî û jinêd di nîva koçan de barêd xwe berhev cihekî dikin.Weko meterîsan çê dikin û hewş dikin û zarokan dikine nîva wê hewşê û tifing û tabançan heldigirin û muntazirî şerêd mêrêd xwe dibin.Eger sîwarêd wan li dijminan xalib bûn qewî qenc e.Bi xwe jî dîsanê koçêd xwe dajon û diçin û eger şayed dijmin li sîwarêd wan xalib bûn ew sîwar direvin û tên dikevine nîva koçêd xwe hesarê ( mudafaa cih ) û dîsanê şerî dikin.Heta hewar ji cihekî peyda dibe.Lewranê adetê Eqradane heman boy şer elbette ew mirovan li boy hewarê bi etrafanda belav dikin û jinêd maqûlêd wan jî roja koçê li hespê çê sîwar dibin û çek û sîlehan girêdidin û rim digirine destêd xwe û ew jî dikevine pêşiya koçêd bi xeml û ser bi zêr.Bi vî terzî dikevine pêşi ya koçêd xwe.Lakîn,jinêd feqîran zarok jî li goşê ko

çêd xwe dajon û diçin...

Û her zomeyekî du nobeddar heyîn.Bi heq şevê her yek li kenarekî dipeyîn.Weko hêsa dijminan bikin, dikine gazî û xelqê zomeyî radibin û diçine wî semtî.

Weko bi şev şayed dost û mêvan bêne zomeyî ew nobeddar diçine berayîkê û gazî dikin.Weko qiralêd ordiyan .Paşê ewan tînine nîva zomeê.Çi qeder mêvan bêne zome ê mêvanê axa yî û rîspîyan e.Îlle eger zehf mêvan heyîn,îcarî serê konê du û sê û zêde sîwaran belav dikin...

Û axayêd wan maqûl û dewletlûyêd wan,hemû xweyî qehwe û taxim in.Eger şayed mêvan jî qehwe û taxim heye nahêlînin ko taxima mêvanan biderkevin û bidine şewlê (şolê ) bila ko qehwe û taxima xweyî malê dixebite û axa û rîspiyan çît û perde heyîn.Yanê nîva konê birrîne û çît û perde kêşan e.û kirine yalî mêran û dîwanxane.Mêvan li wê derê sakin dibin. Mêvanan re berx û pez ser jê dikin û îkram dikin...

Axa û rîspiyêd her zomekî meleyek li malan de dibin ko bang didin û bi cimaat nimêjan dikin û ders a zarokêd wan dibêjin û îqtiza bike nîkah birrîn û mir êd wan li ser dixwînin û defn dikin.Ew zome jî her çî miqdar zekatêd pez û dirafêd wan û fitarêd wan heyîn,hemû didine wî meleyî û zêde jî îqram dikin.Di salekî de meleyî zomeyekî du sê hezar quriş bi dest dikevî.Weko di malekê de mewta hebit,cilêd wî mewtayî jî didine meleyî û caran ewan cilêd wî nafiroşin.Li mewta ciwanan zêde şîn û matem digirin. Libasêd reş werdigirin û serêd xwe reş girêdidin û jin û keç û xweh, gulîyêd xwe jê dikin,qewî zêde matem û şînê dikin...

Eger ew merî mîr e û xwedî hesp û çek û taxim e, hesêd wî dixemilînin û çek û sîlehêd li ser hespan girê didin,ewan hespan li beriyakê cinazeî dikêşin û ew jin û keç û da û xwehêd wî dilaw û lawejêk (lawijêk,lawêc,lawc ) dibêjin."Wî li min bao,wî li min b

brao,wî li min pismam." dibêjin û digîrin û deng û sedaya bavo bavo ya wan diçite gelekê.Yanê merovekî biyanî raste şîn a wan bêtin elbette dilê wî disoje û digîrin.Bi vî terzî bi îxtişam dibin çal (defn ) dikin.Ew jinêd ko guliyêd xwe birrîne ewan guliyan li ser qebra wî meyîtî li kêlekêd wî dilawêsin.Heta panzdeh rojan sibê û êvaran jin û mêr û cîran têne zîyarete qebr a wî,dixwînin û digîrin û sedeqe û xeyran dikin.Ew mirî eger mêr e,libasekî wî bi qiymet mesela qapût û kurik û yaxûd şalê bi biha davêjine ser cinazeya wî û eger jin e,dîsanê libasekî wê bi qiymet davêjine ser cinazê û dibine qebrê.Ew libasê ko avêtine ser cinazeyî ew jî boy melanin.Ew dibin û mele difiroşin û li yekûdu parve dikin.Heta sê rojan zad û taam li mala meyîtî nayête patin.Cîran zadê tînin û bi mêr û jinêd wê malê didine xwarin.

Heft roj ko temam bûyîn cîran diçin û libasêd meyîtî dişon û paşê didine jar û feqîran.Weko bîst roj bûyî mala meyîtî zehf helwa û zadan çê dikin û cîran û gundî û biyaniyan dikine gazî û bi xêra meyîtî didine xwarin û belav dikin û ew libasêd reş heta şeş mehan û yaxûd salekê li ser ehlê meyîtî dimînin. Ew ehlê meyîtî heta ji şînê biderneke vin naçine dawat û kêfxwaşan.Weko mudetê hiznê temam bûyî axayêd wan û xizimekî wan ji boy heryekî ehlê meyîtî anegore halê xwe tiştekî tîne û reşêd wan heldigire ji şînê biderdikevin.Lakîn eger ew meyît begzade û yaxûd axa û merovekî kifş bûye elbette paşê panzdeh rojan hakimê wî welatî xelatek hazir dikirin û dişande pê warisî meytê û têtana hizûra xwe û di gotin: Emrê xwedêye,bilanê tu xwaş bî,mirin riya me hemuyane.Ew xelat li wî warisî dikirin û ji reşê biderdanîn.Merovêd maqûl xeftan dibin û li ser qebra meyîtî ve didin. Anegore halê wî mehekê û panzdeh rojan xeft dimîne û mele bi ucret Qur'anê dixwînin û rojê du danan zad û taam dibine xeftê û ew mele dixwin...

Wekî dinê Eqrad zêde bi kîn û bi qidiret in û

xweyî Înad in.Eger dijminî digel yekî heyîn,daîm li zerara wî digerin û qesda xesara wî dikin û diçine reya yek û du û hevûdu birîndar dikin û ya diku jin. Eger qet'a nebî,ji pê nîva şev ji dûrve bi gulekê yaxûd xewêde razayî,bi gulê li hevûdu dikujin. Ew jî nebî bi dizî agirî bere malê yekûdu didin û yaxûd bi xef rast hesp û deve û dewarêd yek û du bibin,ewan heywanan pê dikin. Eger mimkûn dibe bila ko jehrê jî tevî zadêd yekûdu dikin.Xûlasa dijminahî a wan qewî bela ye....

Ekserî jin ya mela ya şêx dikevine nîva wan neyaran û li hevûdu tînin.Lewranê,ta'îfeêd Eqradan qewî zêde qedrê mele û şêxan û jinan digirin.Ew her sê ta îfe her çî ricaya bikin,ewan meyûs nakin.Zehf dibe du ta'îfe li meydanê dikine şer û ji her du kenaran jî telafiyet bûye weko jin bê û laçeka xwe raxine nîva wan elbette ew du ta'îfe ji yekûdu dibin û ya mele an şêxek bê bikeve nîva wan def a şerî dibe , û Eqrad nêzûkî malêd mele û şêxan nabin û xirabiya wan nakin.Dibêjin koew ocax in,paşê bi me ve didin Îhtiqada wan ew e.Lakîn ekserî şêxêd wan cahil û nexwandî ne guya berê,ecdadêd wan şêx bûne.Weko merovek qebehatekî bikit û bireve xwe bavêje malêd şêxan xilas dibe...

Keç revandin di Eqradan da ayîb nîne.Lakîn bi riza bî.Riza keçê nabî.Weko keç û kurî hevû du heban din û bav û da keçê nadine wî kurî,îcarî kur ewî keçî direvîne,dibine mala axayekî yan şêxekî û xweyiêd keçê be pêy dikevin,eger li rê rast hatî,keç û kurî herduyan jî dikujin,eger rast nehatî,selamet ê^ çûn êdî xweyî ê keçê qadirê tiştekî nabî.Îcarî ew axa û ya ew şêx ko keç û kur çûne malê dikevine ma beynê.Eger malê wî kurî jî tunebe ji kîsê xwe û yan ji cîranan miqdarekî mal û diraf berhev dikin û dibin diçine mala xweyî keçê û rica dikin.Elbette selaha wan dikin,û ewî keçî li wî kurî mar dikin û dijminahî radibe...

Keç û jinêd Eqradan bi xwe bi nefs a xwe mixtar nînin.Bila ko bav û braê keçê weko ew dayine mero-

vekî keç qederê manî nabe.Elbette xûya an ne xuya keçê di wî merovî bistîne.Bilanê keç ji wî xoşnûd jî nebe .Ewa adetê şerî'atê nîne.Bilako şermi ye di Eqradan qewî ayib e ko bav û bra bidit,ew bibêjin ko em nastînin...

Kumreşî û bedgomanî (bidogmanî ) li nik ta'îfeêd Eqradan tu nînin.Mesela : jinêd wanî ciwan digel mêrêd biyanî xeber didin û bi kenin û rûnin û rabin ew bedgomaniyê nakin.Îlla ko xirabî bibînin û yeqîn bikin elbette bîla mecal ewî jinî dikujin û û mêrî jî.Êdî ewan xwîn tune.Kesek li wan nabî xweyî.Eqrad hemû qebehatan dibine xweyî lakîn li şola xirab nabine xweyî.Lewranê li nik wan qewî ayib e...

Yek jî, adetê Eqradan e.Xwîndar şûrê xwe davê stoyê xwe û topekî cawî didine bin çengê xwe û diçit xwe davêjite mala xweyî xwînê ko " Ew e şûr û,ew e kefen,yan min bikuje yan min aza bike." Îcarî xweyî ê xwînê elbette wî xwîndarî aza dike...

Eqrad tabî'et cahîlîn heyîn.Bi fal û minecim û hindik tiştan bawer dikin û hindikan siûn û hindikan şewm (şom ) dizanin û bi nisxeyan bawerî dikin. Bo ew dereceyî ko çawan miletê Efrenc bê hekîm nabin,ew jî bê nisxe nabin.Her çî illet û derd dibî bilanê bibe,elbette nivîşt dikin.Lakîn îhtiqada wan bi hekîman nînin û guhdariya hekiman nakin.Ew dibêjin hekim Xwedê ye,derd û derman her du jî ji nik wî ye.We lakîn Eqrad jî wekî Efrencan qewî zêde ji nexwaşî û webaî û îletêd ko sarîne ditirsin û bi d dûr dikevin.Heta kur û bav û bra,eger yek ji wan bi vî merezî bimirin ewî mirî yî di terikînin û bi xwe helnagirin.Diraf î didine melan,mela diçin ewî miriyî defn dikin.Eger mele jî tunebin wîsanê ewî miriyî di cihdanî dihêlin û bar dikin direvin û eger di gund û zomeyekî de weba hebit kes naçite wî gundî û zomeyî û merovêd ko ji gundê nexwaşî tê heye nahêlin nîva xwe û naçin û nayên.Ew jî weko Efrencan îxtirazî jî nexwaşî dikin.Lakîn ne ji hemû nexwaşîya bila ko ji Weba û Qolêra û halî evna ko sarî ne êdî jî nexwaşêd mayî narevin...

Û adetêd jinêd wanîn ko li ser zarokêd xwe rûtinin

û naçîne şû ( naçine mêr )

Wekî dinê ekserêd wan di muharebe û şerî de temenî dikin.Eger merovek bi ecela xwe fewt bibe dibêjin,"Mixabin,xwaziya bi şerî de fewt bi buwa." Wekî din,Eqrad di şerî de ji hevûdu şerm dikin.Eger di dilde jî cesaret tunebin elbette ji şerma oldaşan dê şerî bike û ya bête kuştin.Eqrad di şerî de gazî yekûdu dikin û xeyret didine yekûdu.Eger mirovek bireve,paşê êdî qedrê wî namîne û jin û mêr tif (tû ) dikin ruyêd wî û mesxere pê dikin û di meclisan de qehweyî di qûna fîncanê de didine wî merovî revî.Û mideteke jina wî jî ewî nadite xeberdan û her rojê ewî pîs dikin.Yanê di Eqradan de di şerî de revîn ji mirinê xirabtir e.Merov bi mirinê raziye,lakîn bi wan rezaletan razî nîne.Ji boy wê xeberê Kurd narevin...

Zehf ta'îfe heyıñ ko daîm digel yekûdu dijmin in. Û kî derê rast yekûdu bên eger firsetê bibînin hevûdu dikujin.Û bi xweser bê emrê hakimê leşker dikin û diçine ser malêd yekûdu û talan dikin.Lakîn jin di nîva wande muraxassin.Ew destê xwe li jinan hilnagirin û dijminahî di gel jinan nakin û qewî zêde xatirêd jinan çav re dikin.Jin biçe rica xwînê jî,dibexşînin...

Dî welatê Bohtan û Hekarî û Bahdinan de di nîva xwecihan de jî zehf neyarî dibe.Du gund ya du qeza û yaxûd di gundekî de nîvî kenarek û nîvî dinê kenarek dibin û digel yekûdu rojekê de du sê şerî dikin û ji du terefan mirov telef dibin û çeperan girê didin û şeşxanan davêne yekûdu. Esla mêrek nikare ji mala xwe biderkeve.Dîsanê jin di nava gundî digerin û diçine malêd yekûdu.Jin muraxassin.Kesek ewan nakuje.Îlla ji boy şola xirab êdî kes ricaê jî nakin,îlla dikujin.Weko weha nebit jinêd Eqradan ji xelkê narevin,paşê gelek xirabî dibî.Lakîn ji kuştinê ditirsin.Çawanî bibe ko yek şola xirab dikin û têne kuştin.Bê kuştin qet'a mimkûn nabin...

Eqrad rojêd îniyan seferê nakin.Şowm dizanin û

roj a sêşenbê jî nexs dizanin.Weko merovek li ser şolekî bibehnije,eger carek be "sebr " dibêjin.Elbette wî şewlî û yaxûd wî seferî nakin.Eger du caran bibehnije "tehcil " dibêjin ewî zerar nîne ewî şolî dikin.Wekî merovek biçite seferê îptîda ko ji mala x xwe biderdikevit eger jin bête oxira wan û yaxûd cerî vala bête oxira wan zehf şowm hesêb dikin...

Û nezer heye.Eqrad nezerê rast dizanin û gelek jê îxtirazî dikin.Guya merovî ko kose û mû zer û çav şîn bibe ji nezera wî merovî elbette ditirsin.Weko merovî bi vî sûretî bibînin ji wî zehf îxtirazî dikin...

Eqrad di reşê de jî weko ê berfê û korî rêçê û dewsê digerînin û dizanin.Weko bi şev sehêd wan direyîn ew ji rêyîna se ê fehm dikin ko ew se merov dîtiye û yaxûd dehbe dîtiye û bi şev guhêd xwe didine erdê,guhdarî dikin ji dûr ve eger siwar bên ew ji dengê erdê fehm dikin û bi wî terefî diçin.Gelek şolêd wan heyîn,guya ewan ceribandine. Ji wan alametan guya fehm a şewlekî buyînê dikin.Mesela : Weko bizin qemçika xwe berjorê bike ew dizanin ko wê rojê baran nabare.Eger bizin qemçika xwe berjêrê bikitin ew dizanin ko di wê rojê elbette baran dê bibarit...

Weko têrek bête derî ê malê û bike gazî,ew dizanin ko dê ji misafirî û xeber û cewab bêtin.

Weko kitik ( pisîng ) bi destê xwe ruyê xwe bimalin ew dizanin ko dê mêvan bêtin.

Weko parî di destan bifiritin û yaxûd ji hevîrê weko jin dibirrin kerîk bifire ew dizanin ko dê mêvan bêtin.

Eger li dora şemalê (mûm ) pîrik peyda bibin ew dizanin ko dê ji bo wan ji der ve kaxez bêtin.

Eger solêd wan yekûdu sîwar bibin guya sefer waq' ia dibî.

Eger nîva destê rastê bixure guya ji boy wan ji

cihekî diraf têtin.Eger nîva destê çepê bixure elbette dê şerek peyda bibe û ji boy şerî hazir dibin.

Eger qapaxa çavê rastê bavêje ji boy wan guya mizgîn têtin û şadibin.Eger qapaxa çavê çepê bavêje bela nazil dibî û mexzûn dibin.Xulasa ji boy hereketa temarêd Bedenê hemuyan her yek tecrubeyek li nik wan heye.

Eger Keskesor li kenarekî peyda bibî,guya li wî kenarî dibitin erzanî û eger êvarê û sibê şewqekî sor li damana ezmanan peyda bibitin,guya li wî kenarî şer û ceng peyda dibitin.

Eger navê yekî bi xeletî bi mirinê biderkeve guya ew merov paşê dijî.

Weko keçek dayîne ( dane ) mêr -bi şû - lakîn hêj nebirine, mêrê wê bi emrê Xwedê mir,ewê jinê şowm hesêb dikin û "serxure " dibêjin û zehf kes êdî nabîne talibê wê jinê.Îlla eger du caran weq'a bibe êdî mazalla kesek li wê jinê naxwazî.Lakîn eger jin bimire û mêr bimîne ewî bi şom hesêb nakın.Bilanê deh caran jî weq'ıa bibe...

Êxtiyar û pîrejinêd wan, ciwanan berhev dora xwe dikin û şewlêd dinê û emwarêd lazime ji boy wan dibêjin û hewariya wan dikin û ji serpêhatiyêd xwe ji boy wan neql dikin. Ko filan weqtê weha buye,filan bi vî terzî kiriye û li filan şerî weha buye.Tarz û rusum û ayinêd şerî ew îxtiyar ji boy lawan neql dikin û exwalêd malan û rusumêd ( resmiyet ) jinan ew pîrejin ji boy keçan û bûkan neql dikin.Û şîreta wan dikin.Çawanê mele dersêd suxteyêd xwe diditin û ew ciwan jî şîretêd wan digirin û ji xebera wan bidernakevin.Weko şayed şolekî dijwar û zehmet li wan peyda bibitin û ji wan kal û pîran tedbîra wê şewlê pirsiyar dikin û ji emrêd mezinêd xwe bidernakevin...

Ehlê Eqrad eger xwecihye -ên ne koçer - û eger rewend,qewî zêde hakim perest û axaperest in.Zêde îtaata hakiman û mîr û axan dikin.Bilanêd hakimêd wan

fileyek jî bibitin êdî zêde îtaat dikin.Lakîn ji hemcinsêd xwe dexsê dikin.Bi înad û kîn û qideret in.Eger ji cinsê wan yekî jêre bibine hakim û axayêd wan,îcarî ewî qebûl nakin û îtaata wî nakin. Elbette fesadiyekê peyda dikin...

Eger Eqrad îhsan û kerem û qenciyê ji yekî bibînin ji bîhr qeh nakin. Daîm ewî qenciyê di nava xelkê de di meclisan de dibêjin,û xirabî jî kezalik.Û ji ber awza qencihê daîm merama wan ewe ko xizmetekî bikin.Ji ber xirabiyê jî mibadele wî bi xirabî û heyfê bikin.Ew dibêjin ko qencî jî û xirabî jî winda nabin.Û xeberdan û cewabê de bê perwa dibin.Hakim bit jî elbette cewaba heq dibêjin û natirsin.Bilanê ewî teezîr jî bikin.Elbette wê cewabê dê bibêjin.Ji xeberdanê de xwedî cesaret in.Eger bibîne kuştin jî dîsanê ji xemê nîne.Yanê bi rastî ji kuştinê weko melalêd mayî ji kuştinê natirsin û dilêyrin.??

Û hespêd sipehî û cins di nîva wande heyîn.Çar cins hesp heyîn,Keêl,Hed,Seklawî,Mîeng.Necdî jî peyda dibin,lakîn kêm heyîn...

Û her sîwarekî cengê pênc agirî dixebitin.Cotek tabanca di qeborê da û cotek tabanca li ber piştan û Qerebîne û rim û şûr û se zirgan jî li ber teng a hespê da dikin.Xûlasa sîwarekî de deh derb heyîn. Wîsan sîwarêd mahir heyîn ko ágir ji agirê nabire. Qewî çapik sîwar dibin...

Hespêd wan qewî zêde bi dewam û şewlekar dibin. Lewranê dibêjin şev û rojê lê sûwar dibin û zehf zorê didine hespa û di şerande jî Eqrad hespêd bi eylem diemilînin û çiqas ko ne buye tengî,zorê li hespêd xwe nakin û dihewêşînin.Hespêd wanî cins şev û rojan ji tirsa dizan revandinê bi qeyd dibin û mifteh jî li nik xweyî malê dibî.Lakîn daîm hespêd sûwariya şev û rojê zîn û hazir lixab li qerpûza zîn dibin û çek û sîlehêd wan tijî û tîz kiriye. Lewranî weko îqtiza bikitin ew Eqrad fîlhal li ser p pişta hespê lazimi in.Daîm ew hespêd xweyî zînan

ceh didin û qenc xweyî dikin.Yanê ew qeder îhtibar nakin ko hespêd xweyî zînan bibin û bitewlînin.Bila ko rojekêde du û sê hewarî peyda dibitin.Lewra li ber derê konê girê didin û hazir dibe.Biharan weko biderketina konan çek û sîlehêd daîm şev û rojan heta diketine qişlaxin xaniyan.Lakîn di xani - yanda êdî rehet in.Hewar û gazî nabî.Ekserêd Eqrayêd dewlemend diraf û giraniya malêd xwe dibin û li bazaran dostêd wan heyîn, bi emanet datînine nik dostêd xwe. Weko lazim dibî diçin û tînin.Lewranî îtibara wan li konan nabî.Ji dizan û ji talan û dijminan emîn nabin.Eqrad bi xwe dibêjin ko dewleta me ya qişlaxe û ya qûşlix e.Bê îhtibare yanê heyam e yanê eger pez û dewar bi zivistanekî şedîd qir dibî û xilas dibe û yaxûd bi taştiyekî ew mal û dewar diçine talanê û dijminek tê dibitin...

Keçêd wan jî dixwînin û mele jî heyîn ders a wan dibêjitin.Ekserêd jinêd wanî naveser qelûnê dikêşin. û qelûnan tijî dikitin û têtin meclîsê nîva mêran. Û jinêd wan kêm nimêjê dikin.Daîm dixebitin û şola malê dikin...

Û jinêd wan bi şev malê gêzî (avlêk ) nakin û paqij nakin.Dibêjin ko şowm e.Û bi şev pif nakin çiraê.Bi şev neynokê nafikirin.Ewna guya li nik wan şowm e.Û bi şev amanan ( firaqan ) ji malê bider naynin û zibilê runakin û nêzûkî êvarê û rojêd çarşenbê serêd xwe û serê zarokan naşon ko nexwaşî peyda dibitin.

Û hasila xwe û malê xwe nîşanî kesekî nadin ko nezer dihengive.

Û pîrejin di nîva wande heyîn weko zarok û yaxûd mirovek nexwaş bibe ewî pîrejinî tînin,ew pîrejin ewî nexwaşî bi nan û xwê efsûn dikin.Paşê ewî nan xwê didine san -segan - dixwin.Guya ew seêd xwarî nexwaş dibin û ew merov û zarok şifa dibînin.Şola cahilî zehf di nîva Eqradanda heyîn...

Gelekê mal dihebînin.Carekê diduyan qewimiye ko yekî miqdarî hezar pezî hebuye û zivistan şedîd bu-

ye,ew hezar pez hemû telef bûye,qir bûne.Paşê xweyî wan pezan çekêd xwe girê daye û li hespê sîwar buye û daye meydanan û tabançe bi kenarê azmanan da agir kiriye û mazallah û gotiye ko: "Xwedê, te pezêd min qir kirin,tu li ku yî ? Were em bikine şer.Û bi xwe jî ji hespê de ketiye û mirar buye. Weha efaîlêd cahilî di nîva Eqradan da zehf heyîn. Weqtê miroveki wanî ezîz û ciwan dimire.Dîsanê dibêjin ko maazallah Xwedê te çikir ? Filan kes kuşt. Xulasa tiştêd bê emriya Xwedê teala zehf dikin.Weko di şerî de di meydanê de eger bra û kurê yekî bikeve braê dinî û bav diçe û xwe davêje ser wî meyîtî,Ew jî têtе kuştin...

Weko zarokêd wan diwelidin,îptida ewî bi ava sar xusul dikin ko guya bi ber sermaê qewî û mihkem dibitin..

Ekserêd Eqradan yek jin heye.Nadir ji axayêd wan du û sê jin dibin.Û jin berdan di nîva wandanî qewî zêde kirêt û ayîb e.Kêm weq'ia dibitin.Jinêd wan zehfî hêse û pare ji malêd bav û daêd xwe nastînin. Bila ko dibexşîne ıdibexşîne warisêd nêr.Lewranî erşêt ( ji heşta yek hêse ) standin di nîva wanda şerm e. Û him bê emîn e,guya herçî mêrasê bibe paşê malê wî jî mêras dibî.Ji mêrasê gelek îxtirazî dikin û ji cilêd miriyan dûr dikevin...

Ew jî mewlûd didine xwandin.Mêr cih de jin cih de zad û teaman tedarik û bixuran ( mîna barûtê ye, agir ko didinê xwaş bihn dide ) disojin.. .

Weqtê îptida keçekî ko dixwazin weko dan,hespekî bi taxim herêkirin distînin.Paşê şêrînî vedixwin û paşê nîşan dikin û qelendê wan zehf dibe.Sed û du sed û pêncsed pez û hind çend bav û braêd bûkê heyîn,elbette ji boy her yekî xelatek lazim e.Bê xelat nabî.

Eger xwedî dawatê axa û ya dewlemend e ew gazî kê ko bikitin qeleqindekî mezin ji boy wî verîdikin û ewan gazî dawatê dikin.Ew mirovêd ko hatine gazî kirin anegore halêd xwe du û sê û deh pezan ji boy

xweyî ê dawatê verdikin.Û paşê jî bi xwe diçin dawatê û ew xweyî ê dawatê ji mesrefa dawatê zêdetir pez û mal ji boy wî berhev dibî.Û eger xweyî dawatê feqîr û jar e,dîsanê boy dawatê xoşhal dibî.Lewranê herkes zêde tewîpayî ji boy wî verîdikin.Hal û malek ji boy wî peyda dibitin.Eger merovêd gazî dawatê dikin merovinê piçûk û bê hal û mal in.Serî her merovekî keleşekirekî piçûk verîdikin.Û ewan merovan gazî dikin dawatê.Elbette ew merovê piçûk jî labid (?) dê pezekî tewîpayî ji boy xweyî dawatê verîdikin.Xûlasa dawat bê tişt nabî.Qasî zehf û hindik dê tiştekî ji boy xweyî dawatê verîbikitin.Jin jî cih de diştan dibine dawatê ji boy keçê.Mesela:Ber û kulav û heqîb û goran dibin û dawatêd wan jî zehf bi deng û stran dibin.Ew bêrita ( liyîstika feqiya ) dibêjin.Dengbêjêd wan heyîn.bêritan dibêjin.Ew jî bo govend reqs dikin.Lakîn jin û mêr,keç û kur hemû têk de destêd yekûdu digirin û dileyîzin.Lakîn dibe ko dawatê maqûlanda def û neyê û kemane û defik û cengir jî hebitin.Ema sazbendên wan mitribin.Her ta'îfeyekî ji Eqradan cih de cih de mitrib heyîn ko xasî bi wan in.Ji biyaniyan mitriban naynin...

Dawatêd wan sê rojan heta heft rojan anegore halî dibitin.Bûk û zavê jî paşê tînin û dixine govendê. Ew jî dileyîzin.Weko bûk û zava dikevine govendê her kesek pez û diraf li wan şabaş dikin û gelek pez û diraf cem'î dibî.Du hêse wî dirafî ji boy xweyî dawatê û hêsek ji boy mitriban in...

Û dawat û ziyafetêd Eqradan zad û teamêd wan birinc û goşt e. Êdî zêde ew zadî û envaî cins cins çê kirin nizanin û adet nekirine.Bilako zehfî qet envaî û cinsêd zadan nedîtine û nizanin.Envaî cins zadê û teamê ye.Lakîn zehf sematan raxinin û tijî zadê goşt û birincê dikin.Ew cemaat dest bi dest rûdinin û dixwin.Û radibin.Destekî dinê têtin û dîsanê zadê weko kêm dibitin tînin.Heta ko nas hemû zadê dixwin...

Weko bûkê tînin,jinek ji mala kurî berbûk dibêjin

diçite mala bûkê û jinek jî ji mala bûkê dîsanê berbûk dibêjin digel bûkê ji wî kenarî têtin. Bûkê sîwar dikin û miqdarekî sîwaran li berayekê dilîzin. Û bi kêf tînine mala zavaî û marî dibirin û bi şev didine gerdekê.Paşê sê rojan ewan jinêd ko bûne berbûk her yekî xelatekî didinê û bi rê dikin.Paşê midetekê mala bûk û zavê gazî hevûdu ziyafetê dikin. Mêr û jin digel cîran û xiziman û hediye didine yekûdu...

Weko şayed weqtê marê baran û berf bibaritin ew dibêjin ko ew bûka zehf binî amanan (tencik ) xwarine û bi taliya ko di dawata wê de baran û berf dîbaritin...

Û Eqrad dawata kirwatiyê dikin.Û dibine kirîvêd yekûdu,ew jî adet e.Wîsan weko yekî mirad dikitin ko merovekî ji boy xwe bikitin kirîva,eger ew her du merov jore jorîn tînin,berê hespekî dixemilîne bi rext û taxim verêdikin.Mala wî merovî ko bilanê bibite kirîvê min.Ew jî qebûl dikitin û bexşîşekî didine wî merovî ko hesp birine û cewabê dide ko,belê ez dê bibime kirîv.Û eger ew her du merovêd ko kirîvayî ê dikin ji qismê usta û yaxûd di adnane ew jî beranekî dixemilînin û dişînin mala kirîvê.Îcarî ew dibine kirîv...

Xweyî ê kurêd ko dê bibine sunnet kirin tedarika zad û teamê dikitin.Wekî rojê dê ew zarok bêne birîn,xelkê gazî dikin û kirîv jî têtin.Paşê teamê xelkê belav dikin.Îcarî dellak (kil,berber,sunnetker têtin,ewan zarokandibiritin.Lakîn bexşîşa dellakê û xelata wî ê ko buyî kirîv ew merov diditin û heta sê rojan,rojê du danan xonçe û zad ji mala kirîvaê ji boy wan zarokan têtin.Weko ew zarok rabûn,ew kirîva ji boy her yekî anegore halê xwe destekî libasî dikitin û dike ber wan.Paşê çend rojekan êdî bavê zarokan ewî kirîvî mêr û jin gazî mala xwe ziyafetê dikin û paşê mêr û jinêd kirîvan anegore halêd xwe xelat didinê û bi rê dikin...

Ji boy xwandina zarokan dayîna seydaê weko Romiyan resmekî muayyen tu nînin.Cûmaliq,meaş û hefteliq tu înin.Berê weko zarok verê kirin seydayî anegore halê xwe hediyeyekî didine zarokê ji boy seydaê dibin.Êdî tiştek tu înin,heta ko ew zarok xitama Qur'anê bikitin.Weko ewî zarokî xitim kir,îcarî bab û daêd wî zarokî rojekê gazî seydaê dikin,anegore halêd xwe du û sê û pênc pez û yaxûd çêlekekî didine seydaê,ew jî razî dibe.Wekî dinê dersêd kitêb û meşq ko dikin,ewan seyda mexsan bi xêra xwe talîm didinê.Ûcret nastînin.Îla ko muderrîsê medresan ucreta wan ji malê weqfê heyîn, distînin.Û muderris sibehan zû têne medresê û dersan dibêjin,heta nêzûkî êvarê,paşê diçine malê xwe.Îla rojêd înê û sêşenban tatîl e.Muderris naête medresê û feqî dersan naxwînin.Di wan rojêd tatîlan da dewr û dersêd berê xwandî tekrar dikin.Adet e ko her kesek ji mala xwe her rojê ser êvarê sê nanan û amanekî zadê her çî xwedê dayiye ratib didine feqîêd medresan.Û qewî melan dizanin û êqrama wan dikin. eger meleyek cahilekî bikute û yaxûd çêr bikitin ew cahil destê xwe lî meleyî helnagirin û xeberan li meleyan venagerînin û li semtê Bohtan û Hekarî û Bahdinan û Soran,weko cahil bi rê ve rastî meleyan bên ji dewarê xwe peya dibin û destêd meleyî radimisin û paşê sîwar dibin û diçine reya xwe...

Eqrad her çî ko xîme nişînin,weko mêvan bêtin,rast dajon derî ê konê.Xweyîê malê jî radibe û pêş ve tên û hespêd wan digirinû girê didin.Eger şayed xweyî malê nêr,hazir nebin,jinêd wan biderdikevin pêşiya mêvanan û hespêd wan digirin û girê didin. Û ewan mêvanan dibine konê.Êdî zêde ji mêrêd xwe êqram û îxtirazî dikin...

Eqradêd xwecih î Bohtan û Hekarî û Soran ,ewan odehêd mêran tu nînin.Bila ko mehmanxana wan mizgeft e.Her çî mêvanê tên,eger sîwar eger peya,eger maqûl,eger jar,rast diçine mizgeftê.Eger sûwar in, gundî diçin û hespêd wan tînin û li mala xwe girê

didin û alif didinê û xweyî dikin.Ew mêvan jî li mizgeftê dihêwirin. Weko buye êvarî ,ehlê gundî mezin û piçûk her yekî amanekî ( firaq ) zadê,her çî Xwedê dayî ye digel du sê nanan li ser destî tînin mizgeftê. Weko nimêja êvarê dikin destexanê radixinin ewan amanêd zadan datînin,digel mêvanan teamê dixwin.Û paşê ji malêd xwe ji boy mêvanan nivînêd razanê jî tînin.Lakîn mizgeftêd wan kuçik (pixêrig,ocax ) tê heyîn.Agirî heldikin,qewî germ dibitin û raxistiye.Weko odeyan bi tedarik in.Lakîn Eqradêd xwecih î Van,Mûş û Beyazîdê ewan her kesekî gora halê xwe yalî mêran heyîn.Mêvanan sakîn dikin. Eger qeh cih tunebe jî li yalî malê,li kenarekî xweyî malê digel jin a xwe û li kenarî dinê mêvan radizin.Nebe cih jî tunebin dîsanê mêvanan ji derî ê malê venagerînin. Lewra li nik wan mêvan nehêwirandin û ji derî ê malê vegerandin qewî şerm e.û ayibek mezin e.Û hirmet a mêvanan dikin.Bilanê millet âxir jê bitin...

Eqrad di malêd xwe de zêde mikerrem in.Mimkûn nabit ko mesela weko malêd mayî Eqrad li cihekî zadê û fêkî bixwin û mirovek ji dûr ve bifikire û li wan nezer bikitin,ew qederekî ji wê zadê û fêkî nedine wî merovî ko nezer dikitin.Lewranê îhtiqada wan ew e ko nefs a wî merovî dibe mar û bi şev tête xewna wî. Û eve guya di nîva wan de micerib e.Îxtirazî ji nefs a xeyran (biyaniyan ) dikin Elbette zehf û hindik dê tiştekî ji zad û fêkî ê bidine merovî ko lê nezer kiriye. Weyaxûd nezerî dikin. Weko dinê ew par a xeyran naxwin.Mesela : sêvekî bi du keriyan bikî,yekî bidê î wî û yekî bidêî merovekî dinê,paşê ew merov jî para xwe ew kerî sêvê nexwitin û bidite wî merovî,ewî naxwin. Guya weko bixwitin pizikekî li serê zmanê wî têtin û zehmet diditin.Gelek caran dibe ko pizik li serê zmanê yekî peyda dibî,ew merov dibêje ko eceb parî lî zmanê peyda bûye, ez nizanim ko min kêngê parî xwariye...?

Weko dinê eger merovekî şayed parî li gewriyê

bimîne destê xwe ji zadê dikişitin û wax xîrinekî min ji dûr ve birçî maye,lewranî parî ji dest min ket. Dibêjin...

Weko serê çiraê pelte belav bibitin ew dibêjin xeybet a min dikitin. Weko rûnê wan şayed ji destêd jinan ru be tenûrê agir bibite alawî (xurrî ) ewî zehf şowm digirin.Ko mala me dê biçitê mêratan Eger rûn nebite alawî ,dîsanê şowm hesêb dikin ko guya mezinê malê fewt dibî.Weko dinê weqtê Berdelacûzê ew"Zêb" dibêjin. Ewan rojan nexs dizanin û ji malêd xwe bidernakèvin.Ûdi wan rojan de naçine seferê...

Weko panzdeh roj dimîne Parêz a Filan (Ermenî )î dirêj Eqrad Xidirnebî dibêjin. Ciwanêd Eqradan î bêkar,keç û lawêd wan sê rojan rojî digirin.Şev a çarî fitarê dikin û avê venaxwin,radizin. Guya her çî kesî di xewnê de avê bidite wê keçê,ew dibe nesîbê wê keçê. Guya eva li nik Eqradan bê şibhe ye...

Weko dinê wê şevê Pûxîn çê dikin û di şkevê de datînin nîva malê. Guya dews a hespê Hz.Xizir li ser wê Poxînê peyda dibe û ew xweyîêd malê şadibin. Ko mibarekîye û xêr û bereket a Hz. Xizir îşev hatiye mala me.Paşê wê rojê ji wê Poxînê helawî çê dikin û li malêd cîran û xiziman belav dikin û ji wê Poxînê heldigirin,vedişêrin. Guya ji boy bereket...

Roj a çarşenba axiriî şibatê,Eqrad axir çarşenba û qere çarşenba dibêjin.Wê rojê kêfxwaşî dikin û digel kesekî dawa û şerî nakin û li malêd xwe zad û teaman zehf çê dikin. Guya li îhtiqada wan de ew e ko her çî kesî wê rojê çi emelê bikitin heta salê di wê emelê de dibitin.Rojêd Îdan adete,mezin û piçûkêd wan elbette helîse çê dikin.Û hèr çî qeder ko du merov digel yekûdu dijmin û neyar bibin elbette rojêd îdiyan digel hevûdu sulh dikin û xeber didin.Heta sê rojan diçine zomêd yekûdu.Îd û Xidirnebî de merovêd maqûl Îdana û bexşîşan didine biçûkan û zarok li malan ji boy Îd û Xidirnebî ê li ma-

lan digerin,pare û yaxûd fêkî elbette tiştekî didine zarokan...

Roj a ko File zadik a hêksorê dikin wê rojê Eqradêd Hekariyan kafirkur dibêjin. Ew jî ji mikrêd Filan bider ve derdikevin giryanê û li malêd xwe zadan çê dikin û dixwin.Û Eqradêd semtê Van û Mûş û Beyazîd ê ew jî di hêksorê de le malêd xwe de ji boy zarokêd xwe hêkan sor dikin û ew jî digel Filan yekûdu hêk dilîzin...

Eqrad zehf îtibar bi ziyaret û bila ko bi dar û beran heyîn.Darekî û yaxûd berekî ziyaret dizanin û qurbanan dibin û ser jê dikin û şemalan dibin vê dixinin. Weko nexwaşekî wan dibitin ahd dikin ko bilanê şifa bibîne ez pêxwasîn biçime filan ziyaretî û qurban û şemalan bibim.Weko ew nexwaş şifaê dibînitin elbette wê ehdê dê bi cih bînin...

Û gelek caran dibe ko jin wa'ad dikin ko filan şewla min bête serî û yaxûd nexwaş î şifaê bibînitin ez dê di reya Xwadê de yixinaxekî ji boy ciwanan bikim.Paşê weko şewl a wê hate serî ewî wa'adê bi cih tînin ewî yixinaxî dikitin.Yixinax ew e ko bi dawata verî dikitin.Her çî keç û kurêd bêkar heyîn û bûk û jinêd ciwan heyîn hemuyan bi şev gazî dikitin û xaniyekî mezin vala dikitin û çiraxan û dengbêj û sazan hazir dikin. Îcarî bi şev her çî ciwan û keç û law di wê meheleyê de û yaxûd di wî gundî de heyîn hemû pêk ve têne wî xanî î.Sazan dikutin û distêrin û govendan diggritin û reqs dikin. Heta ko sibe dibitin.Îcarî her kes belav dibin û diçîne malêd xwe...

Tiştêd weha cahiliyê,wa'adêd weha bedl di Eqradan de zehf heyîn.Carekê kurê jinekê gelek bê kêf buyî,hatibû dereca mirinê.Îcarî wîsanê tête zmanê daê kurê ko dibêje : "Eger Xwedê îcarî şifaê bidite kurê min bila wîsanê nezer bibitin ko ez bi xwe sax bikevime qebrê û bê xwarek sê rojan di qebrê de sakin bibim. Eger di qebrê de helak bûm êdî borî. Û eger ne bilanî paşê sê rojan bên min biderînin." Ewê jinê weha nezr kirî û bi emrê Xwedê kurê wê

paşê çend rojan şifa dibit û xwaş buyî û rabûî.Î carê daê wî kurî nav Rebê bû,û navê wî kurî jî Kamo bû,Êdî Rebê îqdam kir ko ez dê wa'adê xwe bi cih bînim.Û çuye ji melan pirsiyar kirî ,melan îzin nedayîê .Lakîn dîsanê çare le daê kurikî ne buye.Îlla ko ez di ahdê xwe bi cih bînim.Dîtin ko çare nîne çûn qebrek ji boy Rebo adeta weko qebra miriyan kolan,Rebo jî tobe û îstixfar kirî,wesiyet kir ko sê rojan ez di qebrêde dimînim,paşê sê rojan werin qebrê vekin.Eger ez helak bûm îcarî bînin min xusl û techiz bikin û defn bikin û îlla eger ez heta sê rojan helak nebûm min biderînin ez tême mala xwe. Ahd ê min bi cih têtin.Bi rastî îcarê ênan ( anîn ) weko Rebo gotî qebr kolan û Rebê birin her bi ecelî di xwe bê nan û av dirêj kirine qebrê û qebr a wê adeta xalî kirin û nixaft in.Heta sê rojan mayî . Îcarê jin û mêr pêk ve çûne ser qebr a Rebê û qebr bişkaft in û Rebo bider anîn ko hêj sax e û nemiriye. Ênane mala wê.Paşê wê wadeê heft salan emr kirî.Paşê fewt buyî...

Eqrad di wa'adê cahiliyê de zehf qewîne.Weko tiştekî di eqlê wande bi cih bû,êdî mimkûn nîne ko zêhn (zihîn ) a wan ji wî xeberî tedîl bikî. Elbette zanîna xwe dikin..Ehil înad in....

Braê dikujî kurê tê ortê,ewî dikujî bav têtin,yanê ji yekûdu weko qebayîlêd mayî îbretê nagirin....

Û der heq reyan û merovan,dîtinê zêde bi îdraq û xweyî zihn in.Weko Eqrad carekê bi reyekê de biçitin êdî bîst sal jî li ser bibore îqtiza bikitin bi şev di tariyê de ewî reyî bi der tînin,û naxelitin.Yanê ji boy rê û derban zêde xweyî feraset in. Weko Eqrad meroveki carekê bibînin bîst salan nebîne paşê rast bêtin elbette wî merovî nas dikin. Weko Eqrad li rê rast merovekî tên elbette dê ji wî merovî navê û cihê wî û ji ku têtin û bi ku ve diçitin bi ism û resm yek bi yek pirs û pirsiyar dikin. Mesela eger Eqrad ji der ve rast merovekî bên elbette pirsiyar dikin.Navê wî,cihê wî ji bîhr a wan naçin.Paşê deh salan ew Eqrad bêne wê cihê elbette wî

merovî salixî dikin.Û diçin dibine mêvanê wî me rovî...

Û di Eqradan de jî pispor heyîn.Ko hezar berxan tevî hev û du dikin, ew pispor têtin û li wan berxan yekû yekû vediqetînin û davêne ber daê.Yekî naxelitin.Lakîn ew pispor nadir heyîn...

Û ekserêd Eqradan ko di konandanin,bi şev bi sileh heta sibehê rûdinin.Lewranî ji dizan û dijminan îxtiyatî dikin.Û kelbêd wan jî cins heyîn.Kelbêd cins li nik wan zêde muteber in.Û bi qiymet in.Heta bi deh û panzdeh pezan dikirin û difiroş in. Lewranî pawanî ( lê di pey ) mal û kirriyêd wan ji der ve kelb in. Kes nikare ko li kelbêd wan biditin.Eger li kelbêd wan bidin û yaxûd bikujin şer û şemata peyda dibitin...

Eqrad digirin û hespêd cins dikirin.û tînin bere nîva revoya xwe û dibin ji boy dolê.Hespêd bê cins nahêlîne nîva revoyêd xwe û bargîrêd wan jî weko hespêd qazaxan zivistanan jî şev û rojê ji der ve qewî li ber sermaê mihkem in...

Axayêd wanî mezin xwyî deve dibin Elbette qantirek û du sê deve lazim e ko hebitin.Axayêd mezin, konêd Erebî heyîn,ew jî dîsanê konê reş e.Lakîn , gelek mezin û çar istûnîye.Hesêbeke ew konê Erebî jî dîwanxana wan in. Û li etrafêd wê konê Erebî miqdarê deh çadiran jî ji çadirêd spî vedane ji bo xulaman û qehweçî û solgêr û şîrgêr û terzî û çaqmaqçî û sereçî. Ji boy wan ew çadir vedidan û rojê du danan zad û semada axan bi derdikeve. Konê Erebî dîsanê çar sed û pênc sed merovan zadê pê didine xwarin. Wîsan axayêd eşîran hebûn ko rojê barak birinc û ritilekî ( batman ) qehwê serf dikin.Û çi qeder eyalet û cîran heyîn tên û li konê Erebî zadê dixwün û qehwe vedixwin.Kesëk mianet nakitin...

Û axayêd wan zencîr jî heyîn.Ji Eqradan xweyî qebahatan digirin û hebis dikin,û talan dikin û dibe ko mala wî merovî ji nîva êlê xwe diguhêrînin û êxrac dikin...

Ew eyalet jî bê îzin û emrê axayî naçine dizî û xirabiyê. Eger dizî û xirabiyê bikin,tên û dibêjine axayî.Eger paşê xweyî bider ket û nikarin ko ewî malî bixwin,axa ewî malî ji dizan distîne û didine xweyî ê malê.Û îlla eger xweyî malê bi derneketin û kifş nebû,îcarî nîva wî malî ji boy axêye û nîvê dinê ji boy dizan in.Eqrad ekserî cîran û xizim li yek û du şehediyê didin û diçine nik xweyî malê ko hinde qeder dirafê mizgîn bide min ez salixa malê te bidim.Ji xweyî malê dirafê distînin û salixan bê xef didin.Lakîn rû bi rû şehedetiyê nadin.Lakîn mesela navêd dizan dibêjin û cihê malê salix didin û ew mal li kuye,dibêjin.Îcarî êdî înkar mimkûn nabî.Xweyî malê diçin û malêd xwe bi der tînin.Ekserî dizî di nîva Eqradan star nabî,bi der dikeve...

Û Eqrad zehf bi cihê derewî sondê dixwin.Lewranî cahiłin.Maazallah sond çiye nizanin û ekserî sondêd wan bi qebra bav û bra û kurê ye.Û yaxûd bi serê bavê û braê û kurî ye.Lak^ın sondê wanî rast ko ew jî ditirsin û bi cihê derewî ewî sondî naxwin. Sonda wanî ko naxwin ew e ko tînin mist a wî merovî tijî xalîdikin û dibêjin ko ewî xalî yî li ber baê belav bike û bide baê û bibêje : Ko bilanê orta min jî weha ber ba bibe.Eqrad ewî sondî bi cihê derewî naxwin.Guya îhtiqada wan ewe ko eger ewî sondê bi derewî bixwitin mala wî diçite miratan...

Jinêd Eqradan zehf ji mêran bi aqil û kemal û îdraq û merûfaî ne. Zêde dilovan in,rehmê bi xerîb û biyaniyan dikin. Û zêde ehil qenat û xweyî îtaat in.Zêde di malan de sahib îxtiyar in,bê mêran didin û distînin...

Weko Eqrad îptida rast yekûdu tên silav didin û paşê exwalêd yekûdu dipirsin û pirsiyar dikin...

Eqradêd semtê Bohtan û Hekariyan kêm bi ecelêd xwe dimirin.Ekserî têne kuştin.Lewranî ew ta'îfe gelekî serqedan e.Û têz meşerb in.Zû digel yekûdu şerî dikin û hemû ji xweyî xencer in.Yekûdu didine

ber xenceran û dikujin...

Ekserêd wan ji bav û bapîran kevne dijmin li hevûdu daîm digirin. Weko fesalê dibînin elbette yekûdu dikujin. Di nîva wanda li xwînê birîn û diyet çû nîne ( murûrû zeman nîne ) bila ko xwînêd wan dimînin heta weqtê firsetê...

Berê mîr û axayêd wan jî tev mada xwînê nedibûn. Ew dewa a xwînê dimîne heta xweyî firset bîne û heyf a xwe bistîne.Lakîn di xwînêd Eqradêd Mayî musellax dikevine mabeynê û bi xwînê girê didin.Eger xwîndarî heye mal û qidret nîvika xwînê xwîndar dide û nîvika dinê cîran.her kesek miqdarekê didin û yarikarî dikin. Ewî xwînê temam dikin.Û carînan dibe ko ji pêş xwînê jin û keçan didin. Mesela : Xweh û ya keçekî .wî xwîndarî bêkar heye, eger xweyî xwînê razî dibitin ew mirov xwehe xwe û ya keça xwe ji ber xwînê didite xwîndar î û sulh dikin û li hevûdu têtin. Weko sulx kirin û diyet temam buye êdî xwîndar ziyafetekî mezin dikitin û gazî hemû cîranan û xweyî xwînê dikin. Îcarî xwîndar û xweyî xwînê li hevûdu têtin.Ruyêd yekûdu radimîsin û sulx dikin.Êdî dijminahî ji mabeynê radibitin...

Eqradêd semtê Hekariyan ekserî şerî û dewayî bi şev dikin û zehf şebxwînê didine dijminan.Û li cih ê şer î fîlhal çeperan çê dikin û dikevine bin çeperê daw dikin û daîm gulê û barûdê zehf digel xwe heldigirin. Merovek ji du hoqqan kêmtirî gulê û barûdê helnagirin.Ew qeder cebxane û sîlehêd xwe de heml dikin ko eger îqtiza bikitin şev û rojekî cebxana wî têr î şerî bikitin...

Eqrad di emwarêd şerî de di hesp û sîlehêd xwe de zêde îhtimamî dikin û muqayyet dibin.Eqrad hesp û çekêd xwe memnû'e esla bi emanet nadine braê xwe jî. Eqrad dibêjin ko merov jin a xwe bi emanet biditin,ne ko hesp û aletêd xwe î herbê bi emanet biditin. Li cih ê emîn jî dîsanê aletêd wanî herbê li ber serê wan dibî. Lehzekê aletan ji xwe bi dûr nakin. Lewranî Eqrad dibêjin

ko merov hinde qederî zehmet û giraniya çek û ratiban dikêşitin. Ji boy rojekê hewceyî dibe ko wê rojê çek û ratib hazir nebin. Lewranî çekan qet x li xwe bi dûr nakin.Û îxtiyatî dikin ko bila ko x ji nişqe ve hewce bibitin.Heta weqtê ko nimêjê jî dikin,dîsanê çek û ratibêd wan hazir li piştê ne.

Û ekserêd malan da Conî (sîndin) û mêkut heye. Bi xwe dermanê dikutin û çê dikin.Û qalib heye, birkan ru dikin û fişikan bi xwe girê didin...

Lakîn di nîva Eqradan da esnaf û senaatgêr tu nîîn,eger heyîn jî ji ta'îfa filan dibin. Şûrker, hesingêr û solgêr^û xeyat û zêrger û neccar,evne jî ji Filan heyîn. Ji Eqradan tune nin.Îlla ji Eqradan barûtpêj û şûrecî û beytarê heyîn. Lakîn ew barûtpêj û şûrecî û beytarêd Eqradan qewî zêde di emelêd xwedanî hazeq û mahir in. Bila ko nêzûkî ko weko barûta Îngilîzî jî bibitin û beytarêd bê misl heyîn û qewî muteber in...

Eqrad zehf mecbûr di mayîn bi bal şert lîstinê. Şertêd wan ,Mesela : Ji du terefan û yaxûd zêde ji duyan sê û çar qederekî dirafê û yaxûd tiştekî datînin û bi sîwarî diçine qoşiyê.Her çî kesî ber' ê hat û giyaye menzîlê û hespê wî borî, îptida hespê wî bû, ew merov şertê distîne.Û yaxûd dîsanê şert datînin û çend merov armanc datînin û gule davêjin. Her çî kesî sê caran li pey yekûdu lê daye, ew şertî digiritin û caran ji boy şewlekî,bi tirs û zehmet şertê datînin. Her çî kesî ji ahd a wî şewlî bêtin,ew şertî distîne. Mesela :li cihekî mûharebeye û şerekî azîme bûyî û ji du kenaran her yekî sed û du sed merov hatine kuştin. Û her du leşker kêşane ( kişiyane ) û laşêd her du terefan bi digel yekûdu dîsanê li meydanê mayîne. Lakîn mirovek ji wan wenda ne,nizanin ko hatiye kuştin û yaxûd esîr buye. Bi şev şert datînin. her kesî bi tenê biçitin û bigêhite cih ê şerî wê meydanê û seha laşan bikitin û cewabê bînitin ko belê laşê wî merovî li meydanê heye û yaxûd tu nîne. Ew merov diçitin û seh a meydanê dikitin û nîşanekî jî ji meydana şerî tînin û çawa sibe dibe

laşê wî merovî jî tînin. Û ewî şertî distînin.Xûlasa ji boy şolêd weha cahiliyê şert qewî zêde zehf dibin di nîva Eqradan de heyîn...

Û bi xeyrî ji wan ,Şetrenc û dame û gustêr,evne jî heyîne.Bi şertekî meallûm dilîzin.û yaxûd nemeallûm dilxwaz dilîzin. Her çî kesî ew lîz bir ew her çî ko dilê wî bixwaze distînin. Mesela : Hespêd qenc û tiştêd nadir distînin.Dibe ko di şertê dilxwaz keçan jî distînin.Xweh a wî weya keç a wî distînin. Nikul ( poşmanî ) di şertê dilxwazîdanî nabitin.Her çî bixwaze elbette dê bidinê...

Dibe ko bê lîz şert digirin. Ew jî şertê meallûme dibitin. Mesela : Hesp û ziyafet û filan tişt û dilxwaz jî dibitin.Ew şert a jî wîsane ko di sîngê mesela kew û dîk û têran de cinaq ( şertik) heye.Tînin ewî cinaqî du merov dikêşin û dişkînin. Êdî ew her du merov her çî yek mesela qelûnê û yaxûd fincana qehwê û yaxûd fêkî û tiştekî bidit e destê merovî dinê,gerek ew şert daîm di bîhr a wan de bî.Ew merov ko mesela ewî tiştî dayî distîne dê bibêjitin ko " min li bîr e " Eger ewî merovî şert ji bîhre kirî " min li bîhr e " ne got ew mirovî ko ewî tiştî didite destê wî ,îcarî ew mirov dibêje ko " ya dest " an jî " şertik " weko ewî wilo got, ewî şert ji oldaşê xwe biriye.Her çî şert a ew datînin eger ko di fikra oldaşê de weko ewî tiştekî dayî lê standî min li bîhr e dibêje tiştek tune. Ew şert baqiye.Heta ew her du yek bi yekî bixapîne û ji bîhr a a dinê biçitin û ji wî bibitin.Wîsanê mirovêd bi bîhr heyîn ko ew şert nêzûkî salekê di nîva wan de dimîne.Paşê qanimî kê dibitin. Ew şert zehf heyîn. Jin û keç digel yekûdu digel mêran bi şert dilîzin û ji yekûdu dibin. Ew jî dibe ko dilxwaz şert digirin û ji yekûdu şertê distînin...

Di nîv Eqradan de mektûp û kaxezêd wan Farisî el îbare dibin. Xandina Tirkî û zmanê Tirkî kêm dizanin. Kitêbêd zmanê Tirkî li nik wan muteber nînin...

Û faîza dirafê li nik wan heram e. Ew dirafê bi faîz nadin. Bila ko exz û eda wan ekserî selme. Ew jî babekî şer'î ye.Mesela ,zaxîre û kavir û caw haziran bi çend quruşan tête firotin. Çend quruşan ji bihaê kêm diditin û ewan li ser yekî selem dikitin. Paşê şeş mehan. Paşê ewan tiştêd ko selem kirine distînin û bi kar difiroşin...

Û tehwîl û temesik di nîva Eqradan de kêm heyîn. Bila ko şahîdan digirin. Li nik wan îtibara xeta ^ û xatimê tu nîne. Bila ko şahîd lazim in...

Eqrad ekserî eşyaêd mewzû ne bi Erebî bazar distînin,û difiroşin. Erebî bazar ewe ko mesela rûn û penîr û herî her çî bibitin bi texmîn difiroşin. wezn nizanin.Îqbal zêde dibe û kêm dibe êdî poşmanî jî tu nîne...

Mêrê Eqradan dirafê li nik xwe helnagirin. Her çî dirafêd wan hebe li nik jinan in.Jin datînine heqîbêd xwe û di nîva pareyêd xwe vedişêrin.Zehfêd Eqradan xweyî dewlet bi baran diraf di malê de heyîn.Bi wî dirafî hogeçan dikirin û ber hev dikin.Hezar êdî zêde.Îcarî celebêd şam û Erebîstanê salê carekê ji boy kirrîna hogeçan têne nîva Eqradan. Bi baran zêr û dirafê û alacî û cîlêd û dirûyî tînin û ewan kirêd hogeçan bazar dikin û distînin.Û serî kerî jî adet bi xeyrî dirafê xelatekî distînin û resim hediyeyekî jî cw celeb didine axayî wî ta'îfeyî ko hogeçêd wan kirrîne.

Lakîn axayêd mezin aşîran berî ewan jî serî keriyan bacê bi zorê distandin û merov verîdikirin. Berayîya karwan û qeflan. Her kesek ji bi wî xweyî î cebrî resmê bacê distandin...

Û axayêd eşîran berê ji êlan û ta'îfeêd xwe merov tînan û hebs û talan dikirin û bixwasta merovek û du û sê di malêd xwe de qetl dikirin.Hakiman pirs a qetla wan mirovan nedikirin. Lewranî ji ta'îfa wî ne.Ew axayêd eşîran berê di exkamêd eyalet û cîranêd xwe misteqîl bûn.Kesekî pirsiyar nedikirin ko te ji boy çi ewa şola kiriye...

Eqrad zarokêd xwe hewerî sîlahşorî dikin mesela rimbazî û sîwarî û tifing endazî,evna talîm dikin. Zikr û fikrê wan daîm ehwalêd şerî û dawayî ye. Ceng û cidalêd ko qedîm buyîne ji boy ciwanan neql dikin ko di filan şerî weha buye û filan talanêdanî weha buye. Tarîxêd şer û dawa qewî zêde hifz dikin...

Û Eqrad jî emrêd xwe bi waran û bi zozanan hesêb dikin. Tewarîxêd wan jî ew in. Mesela : Hesêb dikin ko em du salan li filan warî û hinde qederî li filan gund î buyîne qişlaq. Bi wê hesêb dikin û emrêd xwe û hewadîs û qewatêd ( Qewa'adatêd ) dinyaê çend sal buye dizanin...

Û ekserêd hesabêd Eqradan bi hesab a şemsî ye. Qewî hesaba qemerî na emilînin. Meger ko ji boy Remezan û îd û mewlûdan weko dinê hesabêd wan Romî ye...

Beran berdan û sedî (serî ) pezêd wan jî dîsanê vî hesabiye. Weko payîz nîvî dibitin adet li nik wan kadan çê dikin û dibin diçine nik keriyêd mîhan û beranan jî dexemilînin û dibine wê derê .Îcarî ewan kadan belav dikin û dixwin,dikin e sayî.Îcarî paşê beranan tevî keriyêd xwe dikin Weqtê ko sed rojê beranan temam dibitin,dîsanê kadê û xwarinê çê dikin û şayî dikin,ji boy selametiya pezêd xwe...

Eqrad eger çi hinde xweyî pez û rizq in,lakîn ji boy xwe mexsûsen pezan ser jê nakin. Meger mêvanekî maqûl bêtin û yaxûd pezekî nexwaş hebitin ewî serjê dikin. Lakîn bi xwe dimirin,pezekî ji boy xwe serjê nakin...

Weko Eqrad mesela îqtiza bikitin şolekî ji boy yekî bi nvîsin ewî xisûsî sariha esla di kaxezêd xwe de zikr nakin,di tirsin ko bila ko bi dest biyaniyan bikeve. Ew şewla paşê meallûm bibe û yaxûd ew kaxez di dest wî merovî de bibite senet. Îcarî di kaxezê de selam û dûan dinvîsin ûzikr dikin. Ko heml wereqe baxêre yanê qewatîne lîsa-

nê heye,hon bi wî îtibar bikin.Hinde dinvîsin û ew cewabêd ko bi tirsin û bi xef in ewan xeberan bizman dibêjin. Qasdan ew jî diçin li wê derê ji boy wî merovî teqrîr dikin. Mimkûn nîne Eqrad şewlêd bi mixatere esla di kaxezêd xwadanê zikrû beyan nakin. îxtiyatî dikin û kaxezêd bê mohr di nîva Eqradanda bê îtibar e. Elbette dê mohr hebî...

Weko Eqrad bi rê ve diçin eger li rê mesela ji heywanêd ko dirinde ne mesela : Şêr û Piling û Gur û Hirç ewan oxir hesêb dikin. Lakîn eger weko heywanêd bê zerar weko Rovî û Guh û Kerguh û êd mayî,evna şowm hesêb dikin...

Û amanêd ( firaq ) vala îynane (anîne ) nîva malê û bi şev sîtil û amanêd betanî ji malî bi derînin evna şowm hesêb dikin...

Weko Eqrad çûne warekî û li wê derê şayed Qrən kete nîva pez û dewarêd wan û yaxûd zerarek li wî warî gihaye wan êdî dimirin naçine wî warî. Eger li qişlayekî mesela zivistan şedîd bibe û rizq û heywanêd wan telef bibin dîsanî ewî gundî şowm dizanin,êdî nakevine wî gundî...

Û dawa û nikahêd wan weko waq'ıa dibitin ew meleêd ko li mala axayêd wan sakin dibin,ew mele marê dibirrin û fesla dawaêd wan dikin. Eqrad ji boy vana naçine bajêr û qesebe û gundan...

Ekserêd Eqradan bi navê daê têne gazî kirin. Mesela: Alo ê Fatimê ,Simo ê Eyşê ,Reşo ê Elê , Û Eqrad jî weko Ereb û Efrencan bi du û sê bavan têne gazî kirin. Mesela : Memo ê Elî Hemdan , Oso ê Xidî Temran ,Toso ê axa î Mendan,evna bi du û sê bavan têne gotin...

Weko dinê ko nik Eqradan wîsanê meşhûr û bawere ko weko zarok têne dinyaê û ji daê diwelide ,me'lûme ko paşê navika wî dibirin. Guya bi çi ko navika zarokî bibirrin guya ew zarok weko mezin dibitin di wê şewlê de qewî mahir dibin. Mesela:

Weko navika kuran bi şûr î bibirin ,ew kur şûrengîv û camêr dibî. Eger navika kuran bi qelemê bibirrin, ew kur paşê ehil qelem û mele û katib dibî.^U navika keçan jî eger bi zêr û imaretê zêran bibirrin ,guya ew keçê dibite xanim û xatûn û xweyî cil û nîmet dibe. Eger nava keçan bi kil weseme ê bibirrin ,guya zêde spehî û rind dibin. Ev adeta li nik Eqradan mer'î ye û di nîva Ereban de jî heye...

Eger şayed jinêd Eqradan bi zehmet bizên û derengî bibitin, merovek dê bêtin ber derê wê xa - neê û yaxûd wê konê bi deng bang diditin bi emrê Xwedê ew jin dizêtin. Û zû xilas dibitin. Carî - nan dibitin ko maazallah zarok der rehm a daê de helak buyî ,nawelidin wîsanî jinêd hazeq ji dayînan heyîn ko dermanan bixur dikin. Ew zarokê fewt buyî bi xwe dikevitin. Û daê zarokê xilas dibitin.

Û hindik qişlaxêd Eqradan heyîn,zivistanê av esla bidest nakevitin. Berfê tînin û der mencelande dihelînin û vedixwin û emilînin û heywanêd wan berfê dixwin...

Û Eqrad weko dijminahî digel yekî heyîn û bi eşkarî qiweta heyfê nebitin îcarî bi xef ji wî merovî li heyfê digirin,yan jî gulekî,bi şev gulê davêjin û lê didin û yaxûd agirî barûtê davêne malê û yaxûd fesalê bibînin jarê didinê.Xulasa bi xef daîm li wî dijminî dixebitin. Elbette dê zaferê pê bînin û zehf dibitin ko dicesîsinin û dijminêd xwe heta li ser nimêjê jî lê didin û dikujin...

Û axa û rîspiyêd wan her yekî ji bi wî mexsûsî malêd xwe du nefer pawan û bekçî heyîn.Bi şev heta sibehê yek li yalîkî malê û konê disekinin û û ya dinê li yalikî konê disekinî û digerin,heta ko sibe dibitin. Û bi xeyr ji wan zomeyî jî du nefer pawan heyîn.Her yek li kenarekî zomey^ı ji dûr ve disekinin û daîm guhdar in.Û ewan guhdaran jî seyêd dijwar li nik heyîn.Ji dûr ve reşayî

û pejne seh dikin û direyîn û diçin.Îcarî pawan jî li pê wan diçin û seh a wî reş î dikin.Eger dijmin e fîlhal dibite şemate,xelkê zomeê jî pê de ber hev dibin.Yanê du deqîqe nakêşe ko hemû ehlê zomeyê bi çek li wê derê hazir dibin...

Eqrad bi îhtiqat cahilîyê qewî bawerî bi şêxêd xwe dikin. Her millet û ta'îfeyekî ji wan mexsûs şêx heyîn.Guya aba û ecdadêd wan merovana salih û şêx bûne.Lakîn niha eve ewladêd wan cahil û bê edeb û nezan zêde zehf heye.Malêd şêxan li çolê jî bimîne nadizin û nêzûk nabin û ji xeberêd şêxan bi dernakevin. Weko nexwaş û dîn û harêd wan Eqradan dibin,ewan tînine malêd şêxên ocaxî.Û pez û dewaran qurban ji bo ocaxî tînin.Û ewî alîlî du sê rojan mala şêxî guya li ocax î dihêlin.Û ew şêx ,bi daran ewî alîlî dikutin û benan ji boy wî alîlî girê didin.Guya şifa dibînin. Eger miqedder bû ye ew mirovî alîl fewt bû xilas dibe û diçite şewla xwe.Û îlla eger ecel nehatiye û ji wî îlletî xilas dibitin. Êdî ew merov guya çiraxî wî şêxî ye.Û li ber benê wî ocaxî ye.Sal bi sal elbette dewarekî dê ji boy wî ocaxî hediye bibitin.Û kur û ewladêd wî merovî jî dîsanê li ber benê wî şêxî ye.Êdî ew mirov naçine nik şêxekî din. Weha bi vî terzî Eqradan her ta'îfeyekî şêxêd wan heye û zêde pê îhtibarî dikin...

Û adetekî din ê jî li nik Eqradan heye mesela weko merovekî ciwan,ezîzê wan weko nexwaş dibitin û nexwaşiya wî zêde şedîd dikitin,yanê di dereca mirinê dibitin û ji xwe bê xeber dibitin ko her kes guya hêviya jiyînê ji wî merovî dibirrin.Mesela eger jin û yaxûd xweh û keçekê wî mirovî ciwan heye û yaxûd da heye ev jinê ko xweh û keç da û jin bêtin yek ji wan ko zêde mêla wê nexwaşî heye,îcarî ew jin radibitin di nîva wê meclîsê de sê caran li dora wî nexwaşî diziviritin û dibêjitin ko min canê xwe fedayî vê filan kesî kir,hon şahîd bin ko bilanê Xwedê teala hayatê bidite wî

nexwaşî. Her çî qeda û bela ya wî heye bilanê bête min.Eger emrê min heye bilanê ew mirg bête min .Ew jinik sê caran li dorê wî nexwaşî dizivire,weha dibêjitin. Carînan tesaduf dikitin ko bi emrê Xwedê teala ew merovî nexwaş ecel nehatiye paşê şifaê dibînitin û ew jinik ko weha ev ahd a kiriye bi emrê Xwedê nexwaş dikevitin û fewt dibitin. Lakîn ev adeta mexsûs e bi jinan ko der heqê mêr û bra û kurêd xwedanî dikin. Lakîn jin ji boy jinan û mêr ji boy jinan û yaxûd mêran nakin...

Û carnan dibitin ko ezîzê yekî zehf bê kêf dibitin û tête dereca helakê. Ew jî der heq şîfa wî nexwaşî de ewêd ko xweyî mal û qidret in,mesela nîva malê xwe û yaxûd selas û rebî'a /sisiyan de yek,an çar yek / malêd xwe ji boy jaran nezr û ahd dikin. Weko ew nexwaş şifa dibînitin ,ewî ahd a ko kirine bi cih tînin. Û ew merovêd jar û feqîrin qiweta maliyê tunîtin ew jî di reya Xwedê de rojî û nimêjê û xetma Qur'anê nezr û ahd dikin. Paşê ahd a xwe bi cih tînin.Û dibitin ko keçan jî di reya Xwedê de ji boy şifa nexwaşan nezir dikin.Mesela : Nezr dikin ko bilanê Xwedê şifaê bidite kurê min ez dê keç a xwe di reya Xwedê de her çî kesî dixwazitin bê qelin bidim. Weko ewî bê kêf şifaê dibînitin ewî ahd ê bi cih tînin...

Guya li nik wan şowm e.Ewî nanî ko îptida dipêjin û ji tenûrê bi der dikevin ew naxwin.Guya her çî wî nanî bixwitin jina wî dimiritin. Weko Eqrad qehwê dipêjin îptida miqdarî fincanekê qehwê dirijînin kuçikê /ocaxê / guya eve par a şêxê qehweyî ye...

Jin û keçêd Eqradan ekserî weko jinêd Ereban ruyêd xwe û enî û lêvêd xwe deq dikin...

Û jinêd wan bi xwe serbestinî diçine aşê û karwanan û di malê de eger kon bibe eger xanî bibe

deh û panzdeh mêr û jin ,bav û bra û xweh û da û jin û bûk û zava ,hemû li nik yekûdu bi cihekî radizin. Lakîn eve zarûriye. Lewranî cih tu nîne ,hemû di xanî û yaxûd konekê denin,çare nabitin...

Jin û bûkêd wan esla ruyêd xwe ji kesî star nakin û narevin û digel hemû kesan jî xeber didin. Lakîn dîsanê ehil edeb û îsmet in...

Wekî dinê jinêd Eqradan jî malêd wan î bi xwe dibin.Mesela ,pez û dewar û diraf ko ji malêd bavan îynane /anîne / û yaxûd mêrê dayî ne ji wê malêd jinan re şekêrt dibêjitin. Mêrêd wan malêd jinan nabin û naxwin. Bila ko ew jin pê kirrîn û firotinê dikin û zêde dibitin...

Ekserî jinêd wan mêrasê ji malêd bavan nastînin. Bila ko her çî ko heye dibexşînin bra û pismamêd xwe...

Eqrad qewî zêde îctinab û xezrî ji malêd weqfan dikin. Bi wî dereceyî ko eger hakim û eger axayekî zalim di nîva wandanî peyda bibitin,ew bi xef diçin û mistekê ji xaliya weqfê tînin û bi ser xanmanê wî zalimî direşînin. Di hindik weqtê de ew zalim ber teref û qehr dibitin...

Ta'îfeyêd Eqradan kumreş û bedguman /bidogman / nînin û zîna û xirabî zû bi zûyî bi bal jinêd xwe ve nabin. Eger jinêd wan digel biyaniyan mesela xeber bidin û bikenin û bilîzin û yaxûd îqtiza bikitin ko jinêd wan li malêd biyaniyan û aynî di nîva malan de jî razin û rabin dîsanê mêrêd wan kumreşî nakin û bidogmaniyê der heq wandanî nakin.Eger çi jinêd Eqradan perdenişîn nînin.Lakîn xirab jî têde kêm heyîn. Ew jî ji tirsan e.Lewranî wekî maazallah jinekî xirabî kir,elbette warisêd wê ewê jinê dikujin,esla îmkana xwaşiyê nîne, îlle xirabiyê wê kuştine. Eger ew jina xirab û ew mêrê ko digel wê buye bi cihekî bi hev re dîtin, mêrî û jinê herdukan jî dikujin û xwîna wan tu nî-

nin û kesek li qehban nabite xweyî.Li nik wan xweyî bi der ketina li qehban qewî zêde ayîb e. Lakîn li qebahatêd mayî dibine xweyî.Xwîndarî û dizî di van de rica û hêvî û xweyî bi der ketin dibitin ,lakîn ji boy şewl a xirab rica û şefaat nabitin.Îlla xweyî êd jinê her dukan jî fîlhal qetl dikin.Û paşê diyet û xwînxwastin jî tu nîne.Îlla eger di weqtê xirabî de warisan mêr û jin li cihekî nedîtin,lakîn kifş bû ko filan mêr digel filan jinê şola xirab kirine,warisê jinikê fîlhal ewî jinê didine ber xençeran û dikujin,û dibin defn dikin.Ji cîran û xiziman esla qet kesek jî êdî ji wî mirovî ko kuştiye napirsitin ko qe ji boy çi eve şola kir û serxwaşî û ta'ziye jî ji vê şewlê de nabitin.Îcarî ew warisê jinê daîm di qesd a wî merovîda ne ko digel jinikê ew şola xirab kiriye. Eger xiste fesalê ewî merovî jî dikujitin. Dîsanê xwîn û diyet tu nîne. Di hemû şolan de sulh û li hevûdu hatin hebe û dibe. Lakîn di vê şewlê de muselha û pevketin nabitin,eve bazar irz e li nik wan qewî zêde ar e. Çara wî bi xeyr ji kuştinê nînin...

Weko dinê kafêd /kafiyêd / qebahatan di Eqradan de peyda dibin.Îlla du şewlêd qebehat ko li nik wan esla peyda nabî.Û bila ko nebûye adet jî. Yek maazallah lewate /homo /- yanê esla weq'a nabitin û îhtiqada wan jî bi rastî ewe ko eger mirofek maazallah lewateyî bikitin,kevir li ser wan dibarîtin.Û cinabetî jî êdî ji ser wan ranabitın. Û qebehata dinê jî mey vexwarine . Mey vexwarin jî di berî niha esla û qet 'a di Kurdîstanê de mey vexwarin tune bû.Lakîn van eyaman bazan ciwanêd wan ko digel Romiyan îxtilatî dikin û mey jî di nîva kibarêd Romiyan zêde mûtad buye. Êdî ew ciwan jî ji boy teqrîba Romiyan bazan mey vedixwin. Lakîn dîsanê kêm heyîn.Ji hezarî mirovek bila ko peyda bibitin. Berê heta File êd Kurdîstanê jî mey venedixwarin. Îlla nadir....

Eqrad weko îktiza bikitin du merov bibezin yek-

ûdu û qewxe ê bikin. ew qewî bi zman çêrî yekûdu nakin. Bila ko ber û ya pêsîrêd yekûdu digirin. bi mest û yaxûd bi xencer li yekûdu didin. Çêr kirin li nik wan fehit e...

Û mêrêd Eqradan ayib e,hune li destêd xwe û riyêd xwe de nadin. Lakîn kil li nik wan adet e. Keç û jin diemilînin û dikêşine / dikişînin / çavêd xwe...

Lakîn ew merovêd ko hiznîne /huzin,keder / ew libasêd sor û qirmiz û cilêd faxre ber nakin û destêd xwe hune nakin û çavêd xwe kil nadin û naçine dawatan û kêfxwaşan. Û li nik wan jinêd bî jî şerm e,xwe naxemilînin û libasêd sor û qirmiz wernagirin û naçine dawat û kêfxwaşan...

Di Eqradan weko yek bê kêf bibitin cîran û dost û xizim tiştekî xwarinê ji boy wî dibin û diçin kêf a wî pirsiyar dikin û dil îmaniya didinê ko Xwadê kerîm e ,metirs ,înşallah kêyfxwaş dibî.û me jî boy te nvîşt daye kirin dê qenç bibî.Lowranî miletêd Mayî (maî ) /medenî /çawanî ko mihtacê hekiman û baweriya tebîban dikin ew qisim Eqrad jî wîsanê mixtacî nvîştan in û pê bawerî dikin. Lakîn Eqrad guh nadine hekiman. Ew dibêjin eger bi rastî hekîm e,bilanê berenê çare î li xwe bikitin ko ew nexwaş nebitin.Merezî Xwedê teala didite şafî û hekim mûtlaq Xwedê teala ye.Lakîn dîsanê hindik pîrejin li nav wan dibin ko dermanên cezewî /cazû / li wan nexwaşan dikin....

Weko merovek fewt buyî feryad û gîrin peyda dibî,îcarî ehlê malê meyîtî ber hev cihekî dikin û jinêd dengbêj heyîn,lawejok û sûwaro dibêjin û dikine qurrî.Îcarî her çî ko ciwanin ew diçine kolana qebrê û mela jî avê germ dikitin û tînin dişon û kefen dikin. Eger jin e elbette bê tabût nabitin.Tabûtê çê dikin û datînine tabûtê û bi cemaat

nimêj a cenazeyî dikin û dibin defn dikin.Eger mêr bibe xweyî dewlet e dîsanê bi tabût çal dikin.Eger

feqîre ,qidret a tabûtê nîne wîsanê bi kefen çal dikin û mela li ser dixwînin. Paşê tên li mala meyîtî rûdinin û didine warisêd meyîtî ko bilanê "serê we xweş bibe û êd malê xwaş bibin,emrê Xwedê ye,mirin ji boy me hemuyane,bê mirin benî adem nabitin.Hinde nebî û padîşah hatine dinya ê hemû jî fewt buyîne.Tu xeman meke." Bi gîrin û xizinî êdî ew mirî avdet nakin.Bi vî terzî teselli didine warisêd wî meyîtî. /mirîyî / Weko buye weqtê esrê ew xizim û cîran digel warisêd meyîtî û melayî diçine ser qebr a wî meyîtî û dixwînin û peran sedeqe belav dikine jaran û vedigerin.Paşê wan îcarî jinên xizim û ciranan digel ehlê meyîtî ew diçine ser qebra meyîtî û digîrin û feryad fîxane dikin û xwaliyê bi serê xwe ve dikin. Û dixwînin û sedeqe didin.Ew jî vedigerin û têne malêd xwe. Êvarî ji malêd cîran û xiziman ji boy mêrêd wan cih de û ji boy jinêd wan cih de zad û teamê dibinû lawahîya wan dikin.Û bi wan didine xwarin. Sê rojan û hindik jî heyîn heft rojan bi vî terzî sibe û êvaran diçine ser qebran û digîrin û xêran dikin....

Qebr kolan û şuştin û helgirtina meyîtî di Kurdîstanê de eger xanî û eger feqîr tu ucret tunin. Herkesek bi sewab a xwe dikitin.Ekserêd cehilleêd wan Eqradan maazallah nanî îman dizanin û bi nanî sondê dixwin û guya dibêjin weko merov nanî nexwitin êdî dîn û îman nabitin. Guya dîn û îman bi nanî qaîm dibitin...

Zivistanan Eqrad sibe û êvaran diçine cdeyêd - axaleran û du sê saetan rûtinin û hêkayet û qiseyan didine gotin û yaxûd behs a şerêd borî û ehwalêd maziyê neql dikin. Weko nîvroj buyî têne malêd xwe û nanî dixwin û alifêd dewarêd xwe didinê.Îcarî eger hewa xawş e,ber hev dibin li ber

rojê li cihekî rûtinin û dîsanê qelûnê dikêşin û xeber didin. Bi şev carînan dibitin ko eger gûz peyda bibitin,distînin û dilîzin.Ew jî qumar e.Hindik didine derê....

Û ciwanêd wan law û keç û bûk,zivistanan her şevê li malekê yixinaxî li wê malê ber hev dibin. Eger saz heyîn sazan diqutin,eger saz tunînin lawêd dengbêj û bûk û keçê tevî hevûdu bêrita dibêjin û distêrin û govend digirin û direqisin,heta nêzûkî sibehê.Îcarî her kesek belav dibin û diçine malêd xwe.Ekserî du şevan û sê şevan carekê elbette yixinaxî di nîva gundiyan ên Eqradan dibitin...

Û eger li gund File jî heyîn,Xars û axçêd wan /xort û keç / jî tevî Eqradan dibin û têktanî govend digirin û dilîzin û gelek caran dibitin ko axçikêd Filan î rind dibitin û kurêd Eqradêd qişlaqçiyan dihebînin û ewî axçikî bi riza wê direvîne û dibitin Misilman dikitin û li xwe mar dikitin. Lewranî Eqradêd ko dikevine ser Filan qişlaxî mal li ser malê dibin. Ewlad û eyalêd Eqradî û fileyî hemû têkdanî di nîva xaniyekîdanî û zadê û nanî bi cihekî dixwin.Ekserî ew Eqrad nanî û zadî ji kîsa Riyan /file / dixwin.Lewranî File nanî û zadî dipêjitin . Mimkûn nîne ko nedine zarokê Eqradan.Elbette nedit jî Eqradê kişlaxçî bi zorê ji wan nan î û zadî distînin û dixwin.Û çirax û debar xulasa kulî qesûr heta biharê hesêbeke ko ew Eqrad mîvanê wî Ria î ye...

Eviya xasî / mexsûsî / bi File nîne.Bila ko weko Eqradêd xîmenişîn dibine qişlaxê misilmanê gundê xwecihî /yerlu / dîsanê Eqrad ewî mûameleyî digel wî misilmanî yerlu jî dikitin.Ewî zehmetî û xisaretî didine gundiyan û Riayan. Şayed eger zivistanî dewarekî wan bi emrê Xwedê telef bibitin,biharê weko Eqrad bi derketin û çûn zozanan îcarî ew merovî xweyî dewarê têtin ji bedla wî dewarî telef buyî dewarekî ji malêd wî gundî yî

cebrî dikêşitin û dibitin ko belî zivistanê dewarekî min li vî gundî telef buye .Eve dewar ji ber wî ve ye.Berê bi xeyîr vî jî Eqradan zehf zalim û teadî li xwecihan û Rîayan dikirin û bîst û sîh sûwar dihatin û dibine mêvanêd gundiyan. Pez û berx û mirîşk /tûtik / serjê dikirin û ceh zehf didane hespan û eziyet dikirin. Weqtê çûnê jî çend quriş diraf û çend cot gore jî îtayî distandin. Îcarî ji wî gundî diçûne gundekî dinê. Bi vî terzî li gundan dewr dikirin. Weqtê ser bêderan dibû îcarî dîsanê Eqrad dihatine gundan û serî gundî çend çûwal tanîn /dianîn /û diavêtine ser gundiyan,ko evana tijî genim û ceh bikin.Çarneçar ew çûwal tijî genim û ceh dikirin û dibirine malêd xwe. Eger nedanayê îcarê dewarêd wan dajotin û dibirin biel zorî. Bi van tarzan li cebir û zalimî bûn,heta van salan. Lakîn di eyam xîlafeta Sultan Abdulmecît Xan dame edl û asanî. Weko îcada Asakîrî Nîzamiye buyî êdî roj bi rojê Eqrad ber teref buyîn û zalim û tedayî ya wan zaîl buyî...

Ekserêd axayêd wanî zorbe telef buyîn û zehfêd Eqradan îskan kirin. Xûlasa ji quwet ketin. Êdî ew şewket û sewlet a berê nemayîn.Niha êdî ewî tarz û etwarî qadir nînin ko îcra bikin. Lakîn dîsanê carînan bi sûretine dinê dîsanê ji zalima Rîayan xalî nabin. Bi dizî jî boy xerez ,lodêd wan dişewitînin û yaxûd agirî bi xef davêjine malêd wan û yaxûd bi şev zevî û mêrg û ziyanêd wan di çêrînin û agirî davêne bêderêd wan. Xûlasa bi her wechî Rîayî ji boy van nefretan ji Eqradan ditirsin û xofê dikin. Çarneçar mureata xatirêd wan dikin. Û eger şayed Eqrad bêne dizî a malêd xwecih a û xweyî malê jî pê hişyar bibitin,dîsanê ji tirsan derba mirinê li wann dizan nadin û nakujin. Bila ko medara û mudafayî yê dikin. Lewranê ji dumayîkê ditirsin. Eger xwecihî lê bidin û mirovekî Eqradan bikujin êdî heta qiyametê şer û şeltexêd Eqradan xilas nabin,daîm bi xef û aş-

kare daw'a wî xwînî dikin û elbette yekûdu li wî tollî ? / tol,gumane ko heyf be / distînin. Eqrad û yerlû kêm xisminahîyê digel yekûdu dikin û keçan kôm didin û distînin. Lewranê Eqrad dibêjine xwecihan Goran û ewan laşeyî û bê cesaretin. Weha ad dikin û dibêjin ko her çî zarokê êd ko ji jinêd goranan biwelidin ew zarok bê wêce /vac /û aware û tirsonek dibin. Sebeb vê xeberê Eqrad keçêd xwecihan naxwazin. Û xwecihî jî dibêjin ko her çî ewladên ko ji jinêd Eqradan biwelidin bê edeb û diz û serkeş dibin. Ew her du qisim rewend û yerlu yek bi yek xwaş nabin û ekserî ji yekûdu ne razî ne û gelek bi yekûdu îhtibarê nakin. Eger mesela biqewimitin li şerekî de Eqrad û yerlu heyîn,Eqrad nabine oldaşêd yerluyan. Dibêjin ew zû direvin. Lakîn fîl weqi'a du sê neferêd Eqradan îqtiza bikitin digel deh neferêd yerluyan miqawemetê dikin û ji wan narevin. Lakîn yerlu weha nînin. Yerlu li ber wan zebûn in.Lakîn ev xebera der heq rewend û yerluyêd Van û Mûş û Beyazîd û Qers û Iranî ne.Lakîn rewend û xwecihî û yerluêd Hekarî û Bohtan û Amadî Soran waha nînin. Icarî emir biakise li wan etrafan rewend li ber yerluyan zebûnin.Û du sê neferêd xwecihan îqtiza bikitin digel deh neferêd rewendan şerî dikin û ji wana natirsin. Û ji nik yerluyêd Hekarîyan rewend laşeyî mexsûb dibin. Lewranî ehalî û yerlu hemû xweyî şeşxane ne. Kêm caran dibitin ko yerlu keçêd Eqradan dixwazin û mar dikin. Lakîn Eqrad esla ji keçêd yerluyan naxwazin. Lewranî jinêd yerluyan heysayî / heysiyet / perwer in.Cebra şolêd Eqradan tahammul nakin û exwalê goçebarî û pez û rizq û girtina hasilê nizanin. Lewranî mimkûn nabitin ko Eqrad jinêd xwecihî bistînin. Jinêd Eqradan îqtiza bikitin bi şev diçine şewlan û şer peyda bitin jinêd Eqradan şerî dikin û yarîkariya ji boy mêrên xwe dikin. Lakîn jinêd yerluyan zêde tirsonek dibin, ji mal bi dernakevin. Lakîn fîl weq'ia jinêd Eqradan nadir el zeman in. Lewranî him jin û him xulam û him pawan û him di şerî de

îqtiza bikitin li derî malê yar û yoldaş e. Lakîn jinêd yerluyan bi xeyr ji jinanî yê êdî kêrî tiştekî nabin. Û ko fecir dibitin jinêd Eqradan ji cih radibin, hespan ditewlînin û dewar û rizq î bere garanê didin û malê û derî malê dimalin. û meşkê dikêyîn û şîrê germ dikin û havîn dikin. Xulasa eger şewate / êzing / tunebitin diçin û şewatê ber hev dikitin û tînitin û nanî û zadî dipêjin. Hêjam mêrêd razane. Esla mêr ji şewla malê tiştekî nakin. Kullî qisawarê şewlêd malan li ser jinêd Eqradan in.Lakîn jinêd Kurmancêd yerlu bi aksa / tersê / wan in.Her çî şolêd malê heyîn hemû mêrêd wan dikin.Îlla nan û zad patinê û cil şuştinê jin dikin. Bila ko heta taştê bêy radizin. Û aware ne. Ekserî jinêd Eqradan feqîr el hal in. Bihar û havîn û payîzan pêxwas digerin û şolan dikin. Zivistanan ew jinêd bêçare çarixêd pê dikin û libasêd wan jî cawî sor û cawî reş û hêşin û çît e. Lakîn dîsanê bi vî halêd xwe razî û qanîne û zêde di emrêd mêrêd xwede ne. Weko mêrêd ewan îqtiza bikitin ewan bikutin esla dest helnagirin û xeyîdîn nizanin û her çî qeder libas û cilêd wê malê heyîn hemû jin didûrin û nadine xiyatê / terzî / ....

Û mêrêd wan jî bi xwe her kesek xesîna beran û boxê û hespêd xweyî fal dixêsînin...

Ji Eqradan qewî kêm diçine xurbetê. Lewranî xurbet li nik wan zêde dijwar e.Heta mesela eger Eqrad biçine leşkerekî û ew leşker tol bikêşit û derengî bibitin,zehfî ji Eqradan direvin û têne malêd xwe.Bê sebr in,di leşkerî de sehf sebrê nakin,heman mude / mudet / dirêj buyî şevê du û sê jê direvin...

Eqrad bi seferêd bi dom ( bi dewam ) qewî zêde mûûn dibin û tabê / tewatê / naynin...

Û ji tifingê zêde ditirsin. Eger li cihekî tifing hebitin Eqrad yeqîna kuştinê bikin,çi qeder bilanê Eqrad zehf û dijmin hindik bin jî xwe na -

dine ser dijminan...

Ekserî camêriya wan bi fesal û bi hîle ye.ji dûr ve dinêrin ew merovê camêr û ehlê şer î nas dikin. Eger derk / seh / kirin ko ew dijmina, cesûr û ehîl herb e,îcarî hîleyî digel wî dikin. Mesela : Li ser rê peya dibin,oldaşêd wî jî xwe li newalekî dixine heşarê,ewî merovî ko li ser rê peya buye gunra dikin. Weko îcarî rêwî û sûwar dibînin ko belê sûwarek li ser rê peya buye ji wî hezer nakin / jê natirsin / Û tên nik wî sûwarî. Îcarî ew sûwar dibêje wan," qelûnê ji bo min tê kin,titûna min xilas buye. " Ew mirov jî rehmê bi wî dikin û qelûna wî tijî dikin.Îcarî agirî jî ji wan sûwaran dixwazitin. Yek ji rêwiyan ji boy wî agirî dijinitin û ew Kurmanc jî guya serê hespê digiritin. Êdî li navî oldaşêd dizî jî ji heşarê bi der dikevin û têne nik wan û bi vî hîleyî ewan dişilînin. Weko Eqrad rêbirî dikin,du merovan qerewel datînine serêd cihêd bilind ko ew her du qerewel li reyan nezer dikin. Eger mimkûne,şilandina wan rêwiya ,îcarî ew qerewel ji dûr ve îşaretekî mesela aba û destmalekî dihejînin û ew sûwarana jî ji heşarê bi der dikevin û bi rêdayî dibin û ewan rêwîyan dişilînin. Weko şilandin çavêd wan girê didin û dibine newalekî bê avahî. Îcarî li wê derê dest û piyêd wan jî girê didin,heta dibite şev,ew diz jî li wî newalî dimînin. Weko buye şev îcarî ew siwarêd dizan,malê dibin û diçin. Lakîn du sê siwarêd hesp çê / Xwedî hespêd beza / li ser girtiyan bekçî / notirvan / dihêlin ko venebin û neçin hewarê nekin. Ew du sê sûwar jî heta berê sibehê dimînin.Paşê diçine şewla xwe...

Lakîn weko Eqrad rêbirriyê dikin,weqtê ser êvarê dikin,ko şev bi ser de bêtin. Şayed hewar jî ji kenarekî de peyda bibitin,dikevite şevê. Êdî evna ewî malî dibin û xilas dikin. Weko Eqrad mesela li talana gundekî jî bidin dîsanê nêzûkî êvarê li talanê didin ko şev bi serdanî bêtin,evna talanê xilas bikin. Yanê daîm qismê Eqrad bi îxtiyad

dibin û hezerê jî dijminan dikin. Bilanê dijmin hindik û ew zehfî bibin jî....

Û daîm meclîs û mijûliya wan ,bexsa şerêd borîne,dikin.Filan weqtê di filan şerî weha bû û filan kesî weha camêrî kir. Miqeyîm zikr û fikra wan exwalêd çek û şerî ne...

Lakîn dîsanê ehil selat û Misilman in.Rojî digirin û zekatê didin. Her çî kesî xweyî dewletin jî dexlê dehan yek zekat diditin û ji dirafê çel zêran û çel qirûşan yekî diditin û ji pezan ji sedî yekî diditin,û ji dewarê ṟeş ji sîh yî yekî zekat didin. Elbette bê zekat nabitin. Eger merovek şayed zekatê bi riza xwe neditin bi raiya hakim û qadî û melan saaî heyîn. Yanê memûrê exza zekatê hene. Ew merov diçin û qederê zekatê jî wî merovî cebrî distînin û tînina anbara beytilmalê û hifz dikin. Paşê herçî kesî ko mihtac û misteheq e ji boy zekatê deftera wan heyîn,hakim û kadî tenbiyê dikin. Ew merovê ehl îstihqaq hemû vî dikevin. Îcarî anegore eyal û ewladêd her kesekî behera wî merovî didinê û dibine mala xwe.Eger ji Eqradan şayed li zomekî ko malêd bê hal û mal heyîn,dewlemendê di wan elbette ewan malan nanî û zadî bi her rojê didinê û axayêd zomeyî elbette xweyî sifre û somet dibin. Cîran diçin û nan û zad û qeweyî wî dixwin. Axatiya Eqradan bi nan û bi kerem û bi qehweyî dibitin. Axa jî ewan cîranan sûwar dikin û dişînine olam û sexreyan û şewlan bi wan didine kirin. Eger şayed mêvan hatine mala axayî û li mala axayî mesela rûn û birinc û qehwe hazir peyda nebitin û ji malêd cîranan ew tiştêd ko lazimin,peyda bibin,dişînin û tînin...

Di nîva Eqradanda teklîf tu nînin. weko tiştek lazim bibî û li mala cîranan ew tişt peyda bibitin bilanê xweyî malê jî hazir nebitin, ew merov bi xonserî / xweserî / diçitin û ewî tiştî lazim bu-

yî tînitin û jin,zarok, jê nahêwişînin û didin. Weko dinê Xwedê nekirê eger mirovek qezayek bête serî û yaxûd jarek / feqîrek / dê dawatekê bikitin û yaxûd dê hespekî ji boy xwe bikiritin ew merov diçite nîva êlê û aşîran ricûyî. Elbette mezin û piçûk her kesek ane gore şanê xwe êkram dikin. Ên ko^pez û dewar û diraf didinê û ji boy wî merovî xêlek mal ber hev dibitin...

Konêd Eqradan jî derece derece dibin. Ji du istûnan heta neh istûnan kon heyîn. Ji neh istûnan zêdetir kon nabitin. Ê ko gelek jar e, du istûn û sê û çar, êd ust jî pênc û şeş û heft ,ê ko axane û bi zêde dewlet in û konê neh istûnî dibin û ewan konêd neh istûnî çît û perde dibin. Yanê yalîkî konê dibirrin û perde dikişînin û dikine dîwanxane ji boy yalî mêran. Û ewan konan rewaq heyîn,pêşmal pêştimal dibêjin, weko tinifêd çadiranin. Weko berf û baran û serma dibitin ewan pêşmal û pêştimalî mîwek dikin. Û di nîva konê de le yalî heramê û li yalî mêran li du cihan agirî hildikin û kon germ dibitin...

Eqrad mezin û piçûk mecbûrî qelûnê ne û her çî mîwanî bêtin elbette ji boy her yekî qelûnekî tijî dikin. ..

Weko mîvan tête zomeê ew jî difikirin her çî konê ko mezine,dajone derê wê konê. Mîvan naçine derêd konêd piçûk. Lewranî ko dizanin ewan yalî mêran tune û bê hal mal in. Ekserî xurekê / xwarina/ jar êd wan nanî ceh ye û nanî garis û dew û mast û jajî ne...

Ew taximêd ko maazallah dizî û xirabiyê dikin ew jarêd Eqradanî bê îlac in. Lakîn xweyî malêd dewletlû esla heramê nêzûkî xwe nakin û xêr û sedeqan didine jaran. Elbette di her zomekî de deh û panzdeh malêd jar heyîn ko ew malêd axan û dewlemendan sibe û êvaran ratib li wan malan girêdayîne. Nan zad û dew, her çî peyda dibitin ji boy wan verîdikin. Û ew mêrêd wanî jar jî sibe û êva-

ran li malêd axa û dewletluyan nanî û zadî dixwin. Ê ko zêde dibitin ber hev dikin û dibine malêd xwe, ji boy eyal û etfalêd xwe...

Şayed weko axayek û ya dewlemendek kurêd xwe sunnet bikin,elbette ji kurêd feqîran û sêwîyan çend nefer zarokan digel kurêd xwe sunnet dikin. Lakîn dîsanê zehf dibitin ko ji Eqradan bê sunnet dimînin. Heta ko xweyî jin û zaro jî dibin û êxtiyar dibin,paşê di wî halî pîrî yî xwe sunnet dikin...

Di nîva wandanî dellak tu nînin,bila ko bi xwe bi xwe / xwe û Xwe / serêd yekûdu kur dikin. Lakîn cerrahên qewî qenc ji wan de pêda dibin. Lewranî daîm şolêd wan birîndarbûn e....

Di nîva wanda şemal tu nînin. Malêd axayên wan û maldaran Pêsûs heyîn. Ronî datînin disojin. Lakîn malêd feqîran agirî heldikin,li ber roniya wê rûtinin....

Û di nîva Eqradan da cariye.Şayed weko dilê lawekî di keçekê de hebitin û ewî keç î nedine wî lawî,paşê bidine merovekî dinê û ew jî dawatê bikitin,şev a gerdekê ew lawê ko dil di keçê de hebuye û nedane wî,îcarî ew law ewî zavayî bi xwandinê û bi nisxeyan girê didin. Weq'a jî ew zava tête girêdan û qadirê gerdekê nabitin. Û zehf middeyî wîsanê girêdayî dimînitin. Paşê çarekê lê dikin. Û zehf caran dibe ko êdî esla ew zava li wê jinê venabitin. Axirî ewê jinê naçarî telaq diditin û diçitin jinekî dinê tînin. Êdî der heq wê jinê de girêdanî nabitin....

Weko dinê di nîva Eqradan da malêd wan kirasêd herbê çê dikin. Ji cawî hemû dinvîsin.weqif û tilsimê ewan kirasan axa û agîtêd Eqradan bi pênsed û hezar quruşan dikirin û roja cengê di bin cilêd xwedanî werdigirin û diçine herbê.Alatê herbiyê û gule le wan merovan dikevin lakîn te sîr nakitin. Salih û selam dibin. Ew ta'ife qewî

zêde bawerî û îhtiqadî bi nvîştan dikin. Û fîl weqi'a jî seba îhtiqada wanî dirist her çî ko ew guman dikin weha miyesser dibitin. Heta carînan devê guran û dirindan bi xwandinê girê didin. Bi rastî nêzûkî pez û dewarêd wan nabitin. Û maran efsûn dikin û digel xwe heldigirin û dikine paşilêd xwe û li istûyêd xwe dielînin / dipêçin / esla zerarê nakitin...

Û hinde ji wan heyîn. " Esmayêd seryanî hûrî " bûne.? / gumane navê horiyanî sirrî weqif bûne / Dixwînin û bi şûr û bi kêrê bedena xwe dibirin û birîndar dikin. Lakîn xwîn ji birînê bi der nakevin. Dîsanê fîlhal xwaş dibitin û cihê birînê xuya nakitin...

Di nîva Eqradan de şûr û metal / mertal / lîzitin qewî zêde meqbûl e.Û ekserî lawêd wan middeyekî tealîm û meşeq dikin û hûrî /hîn dibin / yanê wîsanê di îlmê mita'lê de mahir dibin ko ji pêşve her çî şûr û derb ê ko bêtin hemûyan jî defî dikin.Esla zerarekê nakin wûcuda wî. Lewranî di cihêd wanî xwe bi xweyî de / cihên pasê / derbên wan xencer û şûr û gule kêm heye. Elbette şivan û gavan û zarokêd wan jî şûr û metal û xencer heyîn. Lakîn eve adetê Eqradêd vî kenarî ne. Îlla Eqrad û rewendêd Hekarî û Bohtan û Behdinan, mezin û piçûkêd wan xweyî şeşxane ne. Bê şeşxane naçine ser avê jî. Û daîm şewlêd wan armanc û nîşan e.Qewî zêde gule endaz in.Têr li hewaê perwaz dikitin. Ji jêr ve bereki bi şeşxane davêjin û lê didin. Lakîn tifingêd qewal jî li nik meqbûl nînin.Îlla dê şeşxane bitin. Û gelek dibitin ko ji wan Eqradan mexsûs ji boy şeşxanekê diçine Îstenbolê û begen dikin û ji boy xwe tifingan tînin û mele û feqîyêd wan jî hemû xweyî şeşxane û çek û xencer dibin...

Adetekî dinê jî ewan Eqradêd xwecih yî heyîn. Zivistanan weko dibite meclîs ew dikine Gerelawêj. Gerelawêj ewe ko her çend merov di wê meclîsê de hazir heyîn,maqûl û mezin û piçûk hemû dê-

her yek bendekî stranê labite / lazim e / bi bêjitin. Ji serî meclîsê dest pê dikin,heta dumahî a meclîsê. Şayed weko mîvanek di wê meclîsê de peyda bibitin,bêçare dê elbette ew mêvan jî dê bendekî istranê ji boy wan bibêjitin. Negotî elbette nabitin.Ew Eqrad ji vî bend a stranê re Gîsik / diyarî,dên,sira xwe / dibêjin. Elbette mêwan jî dê Gîsika meclîsê biditin...

Ser êvaran her çî ciwan û lawêd zomeyî heyîn, hemû ber hev dibin li ber malan ,ya hol /top,go/ û yaxûd cirîdê dilîzin û her çî êxtiyar in,ew jî ji kenarekî de seyrê dikin. Û her çî keç û bûk û jinêd ciwan in,ew jî teşiyêd xwe heldigirin / diêrêsin / li kenarekî ew darik dibêjin li wê derê her kesek teşiya xwe dirêsitin. Ew jî sêra wan lawêd ko dileyîzin dikin. Û her çî ko zehf pîr û êxtiyar in,ew jî li derê konan rûtinin û sêra lîz a ciwanan dikin. Weko buye êvarî her kesek şewlêd xwe dibînin û dewar û hespêd xwe dawirînin û teamê dixwin.Weko du saet ji şevê çuyî li pêşiya konan dikine govend. Lawêd ciwan û keç û bûk têne govendê,mêr û jin destêd yekûdu digirin û keç û bûk distêrin,û dilîzin,heta nêzûkî sibeyê,Îcarî belav dibin û her kesek têne malêd xwe û radizin...

Eqrad zêde bê xem û xeze dibin. Qewî fikra heyî û neyî ê nakin...

Pîr û êxti yarêd wan jî ekserî rîşî / piskûl, gulî / û bi keyf û çav kildayî ne û daîm terenûmê dikin.Yanê zû bi zûyî ji keyf a xwe nakevin. **Di** dawatan de ew pîr û êxtiyar jî dilîzın û dikevin govendê,li nik wan ayîb nîne...

Weko dibite dawat, Hune datînine nîva destê zavê. Kurêd azeb ji destê zavê direvînin û huneyê datînine nîva destê bûkê. Keç ji destê bûkê hunê direvînin guya nişaniya ko îqbala wan keç û kurêd azeb jî vebitin. Û ew jî bi zuyî bizewicin...

Eger mala bûkê nêzûke,du merov ji eqrabayêd zavayê dikevine bin çengêd bûkê û hêdî hêdî bûkê tînin. Eger mala bûkê û zavê ji hev dûr in,bûkê li hespekî bixeml sûwar dikin û tînin...

Weko bûk hate derê malê zava û çend azeb li cihekî bilind disekinin û zava bi kulman peran direşîne serê bûkê û zarok û fiqare ewan peran ber hev dikin. Weko bûk hate ber derî naçite hindûrê xanî û ya konê. Îcarî xweyî dawatê xelatekî didite bûkê. Paşê ew bûk diçite nîva malê. Weko bûk çuyê nîva malê,legen,misîn tînin ,ew bûkê dev û ruyêd xwe dişotin. Şerbet û şekirî jî boy wê tînin weha êdî dimînitin. Paşê ewê bûkê jî dibin û dixinine govendê. Elbette bûk jî dê çend girikan bilîzin. Çare nîne,paşê weko bi şev zava gerdek buyî ji lawan çendek dikine şayî û tapançe agir dikin....

Şayed eger zava girêdayî bitin gerdek nebitin ew lawêd dawatê ewî zavayî dibin dixinine çemî, ava sar lê dikin. Paşê tînin zavayî verîdikin nik bûkê gerdekê. Weko wê şevê ew zava ğerdek nebitin qewî ayîb e. Û sibê li xelkê peyda dibitin ko ew bûk keç û bakîre nîne. Lewranî ewna aşikar nakin,Maazallah eger bûk bakîre bidernekevitin qewî riswayî dibitin. Ewê bûkê verîdikin mala bavê û qelinê dayî distînin, ev xweyîêd jinê evê bûkê dikujin.Îcarî dibite neyariyekî mezin,Lakîn şayed eger îqtiza bikitin ko bûk keç nebitin elbette ew bi exwalê xwe dizanitin. Weko buye tedarika dawatê ew bûk bi xwe jariyê dixwitin û berê dawatê telef dibitin,êdî namînite wê rojê.

Eqrad her çî heyîn rewend û xwecihî hemû şafiî el mezheb in. Di nîva wandanî ferdekî ji hehifî û Malikî û Hembelî tu nînin.

Di Kurdîstanê de cindar heyîn ko ji şêxêd wan in. Weko merovek dîn dibitin û bitaban /Cin /bikevitin guya ew şêx evî dînî dibite nik xwe û

tasekî tijî av dikitin û guya dixwînitin û çi qeder ecnî heyîn guya ber hev nîva tasê dibin û ew şêx dijminêd wî dînî digiritin û qamişekî tînitin guya ewî Cinitî dikute nîva wî qamîşî û derî qamîşî şima / mûm / ^dikitin û davêtine avê. Guya ew dîn şifa dibîne û ji cinûnî xilas dibitin...

Li nik Eqradan Pîldar dibin.Lakîn ew pîldarî ji zarotiyê de guya îcad dikin. Mesela weko jinekî hamîle meram dikitin ko ewê hemîl ko ji dê dibitin guya bilanê pîldar dibitin.Waxtê ko ew zarok diwelide fîlhal karekî tînin serjê dikin û goştê wê belav dikin. Lakîn pîlê wî / wê / bidertînin û tînin kun / qul / dikin û bi qederî serî çiçikê daê,û serî çiçikê ji vî pîlî bi der tînin û memikan vî kunî de didine wî zarokî. Daîm wehanî çiçikan di vî kunî pîlê de didine wî zarokî. Esla bê pîl çiçik nadine wî zarokî,heta ko ew zarok ji çiçikan tête birrîn. Weko ew zarok ji çiçikê hate birrîn îdî rojê du caran sibê û êvaran tînin û ewî pîlî didinê destê wî zarokî li wî pîlî nazir dikitin. Weha heta ew zarok digehîte dereca eqil û kemalî. Weko ew zarok giyaye dirk û îdraqî. Îcarî guya ew zarok li wî pîlî nazir dikitin û her çî mirad û hewadis li dinyayê peyda bibin ew merov li wî pîlî de dibîne û neql dikitin. Lakîn ew şert a heye ko qet rojekî ew pîl nehatibe terikandin. Aleyîl dewam şîr ji wî pîlî de bê vexwitin. Eger carekî jî biterikînin ew şewla ji boy wan miyesser nabitin. Ew şewla pîldariyî, guya di nîva xeyrî Eqradan dibitin. Lewranî min bi xwe bi çavêd xwe paşayek ji ehlê Urmiyê dît ko navê wî Seyfeddîn paşa bû,ew jî pîldar bû,û pîl digel wî hebû û li pîl nazir dikir û hewadîs û qewadat neql dikirin.Û ewe pîldarî mexsûsê qismê mêr nîninbila ko ji jinan jî heyîn. Û ev du qisim merov le Kurdîstanê de qewî zêde meqbûl dibin û gelek bawerî ê bi wan dikin û ew cindar û pîldar,gelek malê û dirafê peyda dikin. Lewranî Eqrad îxtiqada wan

dikin.

Û hindik jin jî di nîva wanda heyîn kö li falê difikirin. Tasê tijî av dikitin û datînine pêşiya xwe û li vê ava tasê nazirî dikitin. Îcarî guya ew merovêd ko hazir buyîne nêta wan yek bi yek dibêjitin û Eqrad jî bawer dikin. Ji xebera pîldar û tas nêhêrî bi dernakevin. Lakîn ji wan guya ew pîldarî miceri̇b û rast dibitin û dibêjin...

Û efsûnker jî di nîva wande heyîn. Lakîn pîrejin dibin. Ew jî weko merovek nexwaş dibitin li wî efsûngêrî tînin, kerîkî nanî; hindikê xwê dikitin nîva nanî û dipêçe û li dûr etrafêd serê wî nexwaşî çend barkan / car / digerîne û guya tişteki dixwin. Paşê li vî nanî û xwê davête ber se î û ew dixwitin. Ew merov guya şifa dibînitin...

Di Kurdîstanê de lakîn li kenarî Hekariyan kevirî heyîn. Kevirî ewin ko ew merov weko bizinêd kovî li beran / kêre, baxir / û zinarêd asê digerin û pê ve diçin ko nakevin û çavêd merovan reşeve têtin. / yanê eqlê merovan sekinî / ....

Di Eqradan her tai'feyekî di nîva wandanî çend mal mitirbêd wan heyîn. Ew begzade dibêjin. Ew mitirb feqîr hal dibin û şewlêd wan saz û soz û def qutan û sazende ne. Li dawat û şaîyan saz diqutin û mewîdetiyê dikin. Û jinêd wan jî ji malan parsê dikin. Bi vî terzî medarî / îdare / dikin. Lakîn ewan jî zmanekî mexsûse heyîn ko bi xeyr ji mitirban kesek ewî zmanî nizanin û malêd xwedanî bi wî zmanî xeber didin. Lakîn digel Eqradan Kurmancî xeber didin. Kesî ji Eqradan jinan nadine wan û ji wan jî jinan naynin....

Li Kurdîstanê ji Eqradan taî'fa Êzidîyan jî heyîn ko Misilman nînin. Êzidî ne. Rism û ayîn û erkanêd wan jî cê ne. Ew ta'îfe bi Îblîsê dipirsin û dibêjin Şeytanî Melek Tawûs. Lakîn zmanêd wan Kurdî ne. Eger behs a wan jî temam bikim êdî ew rîsale dirêj dibitin,ev qeder jî bes e....

Eksered Eqradan istêrikan / stêrkan / nas dikin û bi şevan îqtiza bikitin ew li istêrkan difikirin û reyan û etrafan dizanin û bi der tînin. Û ji seyr a wan stêrkan mesela buyîna berf û baranê fehm dikin......

Dawî

